**Bîra Helbestê - II**

# HELEPÇE

Amadekar: Mehmet Saît Arzû

J&J | Helbest

**AJANS J&J**
Kooperatifler Mh. Rizvan Ağa Cad. Öz Emek Apt. A Blok No: 33 Daire No: 1 | 21100 Yenişehir | DIYARBAKIR
**Telefon:** +90 412 228 36 06 | **Mobile:** +90 533 436 58 54
**web:** www.jjajans.com | **email:** info@jjajans.com | ajansjj@gmail.com

**© Ajans J&J** - 2019 | **Sertifika No:** 44569

**Bîra Helbestê - II** | HELEPÇE
Amadekar: Mehmet Saît ARZÛ

**J&J - Helbest:** 0526

**Çapa Yekemîn:** Adar 2020

**ISBN :** 978-625-7978-22-4

**Naveroksazî:** Jana ZANA | **Zimansazî:** Adil QAZÎ | **Rûpelsazî û Bergsazî:** J&J **Wêneberg:** Bavê Meryem

**Baskı:** Azde Ajans Basım Yayın Dağıtım Tasarım San. Ve Tic. Ltd. Şti. **Adres:** Kızılay Mah. Menekşe 2 Cad. No: 25/11 Çankaya | ANKARA **Telefon:** +90 545 376 21 22 | **Sertifika No:** [AZDE AJANS | 40800]

© Mafê wê parastî ye.

© Ji bilî danasînê bêyî destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.

**Bîra Helbestê - II**

# HELEPÇE

Amadekar: Mehmet Saît Arzû

Mehmet Saît Arzû; di sala 1981î de li gundê Xirbizilê ya Xana Axpar (Çinar) a Amedê ji dayik bû. Dibistan li gundê Xirbizilê û li navçeya Xana Axpar xwend. Di dû re li zanîngeha Cûmhûrîyetê beşa Civaknasiyê kuta kir. Di wan salan de ji ber sedemên polîtîk demekî kin di zindanê de ma. Pişt re li zaningeha Gazîyê lîsansa bilind kuta kir. Ji zarokatiya xwe de bi wêjeyê ve têkildar dibû. Di salên zanîngehê de tevlî hevalên xwe di nava karê kovara Kizilirmak de cih girt û edîtorîya kovarê kir. Di çapameniya azad de di beşa înternetê de çend nivîsên wî hatin weşandin. Ji salên nodî pê ve bêtir li ser zimanê Kurdî têkildar bû. Demek dirêje di nava hevalên xwe yên wêjehez de xebatên zimanê Kurdî dike û bêtir jî li ser helbesta Kurdî hûr û kûr dibe.

Berhemdarî:
* Bir Daha, Helbest, Weşanên J&J, 2016 - Amed
* Çokeşli Evlilik, Lêkolîn, Weşanên J&J, 2016 - Amed
* Banga Bêdengiyê, Helbest, Weşanên J&J, 2019 - Amed
* Bîra Helbestê I Robozik, Helbest, Weşanên J&J, 2019 - Amed
* Bîra Helbestê II Helebçe, Helbest, Weşanên J&J, 2020 – Amed

# NAVEROK


◊ PÊŞEK ........ 13
◊ PÊŞGOTIN ........ 15
◊ DESTPÊK ........ 17
  » Navê qirkirina Kurdan: Enfal ........ 17
    ◊ Seyît Evran ........ 20
    ◊ Çavkanî: ........ 20
◊ GORISTANA KU 5 HEZAR MIROV LÊ NE: HELEBCE! ........ 21
    ◊ Yaşar Aksu ........ 24
    ◊ Çavkanî: ........ 24
◊ ŞÊRKO BÊKES ........ 29
  » Jiyanname ........ 29
  » Helebçe ........ 31
  » Hawara Enfalê ........ 32
◊ Dr. REFÎQ SABÎR ........ 38
  » Jiyanname ........ 38
  » Berhemdarî ........ 39
    ◊ Honrawe: ........ 39
    ◊ Lêkolînewe ........ 39
  » Lawkî Helebch ........ 40
◊ EZÎZ DERDAN ........ 41
  » Halebçe ........ 41
    ◊ Çavkanî: ........ 42
◊ EHMED HUSEYNÎ ........ 43
  » Jiyanname ........ 43
  » Berhemdarî ........ 43
  » Goristanên Teng ........ 44
◊ NAMIQ HEWRAMÎ ........ 57
  » Jiyanname ........ 57
  » Berhemdarî ........ 57
  » Dîsan Nusînewey Naûmêdî ........ 58
◊ M. EMÎN KAÇAN ........ 60
  » Hewar To Rê Helebçe! ........ 60
    ◊ Çavkanî: ........ 60

◊ BERKEN BEREH ........ 61
» Jiyanname ........ 61
» Berhemdarî ........ 61
◊ Pirtûk: ........ 61
◊ Werger: ........ 61
» Helebçe ........ 62
◊ pîr û kal/ ........ 63
◊ dergûş/ ........ 64
◊ dayik / ........ 65
◊ zarok / ........ 66
◊ mamoste / ........ 67
◊ axa/ ........ 68
◊ xort/ ........ 69
◊ helbestvan/ ........ 70
◊ şivan/ ........ 71
◊ Xuda/ ........ 72
◊ mirovahî/ ........ 73
◊ dîrok/ ........ 74
◊ ÎBRAHÎM HEWRAMANÎ ........ 75
» helebce ........ 76
◊ Serçawe ........ 77
◊ KAMRAN SIMO HEDILÎ ........ 80
» Jiyanname ........ 80
» Berhemdarî ........ 81
» Bihara Beravêtî ........ 82
◊ ARJEN ARÎ ........ 84
» Jiyanname ........ 84
» Berhemdarî ........ 85
» Li Ser Helebçe ........ 86
◊ LEYLA BERZENCÎ ........ 87
» Jiyanname ........ 87
» zamî helebce ........ 88
◊ MIZGÎN RONAK ........ 92
» Jiyanname ........ 92
» Berhemdarî ........ 92
» Li Helebçeyê Sêv Jî Me Dikujin ........ 93

» Sîmayekem Helebçe ........ 94
» Helebçe ........ 98
» Helebçe ........ 99
» Jantirîn Helebçe ........ 100
» Bajarên Sêvîn ........ 101
◊ HEME EHMED CAF ........ 102
» Jiyanname ........ 102
» omerî xawer degerê tewe helebce! ........ 103
◊ NURCAN DELÎL ........ 109
» Jiyanname ........ 109
» Berhemdarî ........ 109
» Bêhna helebçeyî ........ 110
◊ MERVAN SERHILDAN ........ 112
» Jiyanname ........ 112
» Berhemdarî ........ 112
» Helebçe Rabe ........ 113
◊ NAYÊB MÊNBERÎ ........ 114
» Jiyanname ........ 114
» Xeware ........ 115
◊ ROZA METÎNA ........ 116
» Jiyanname ........ 116
» Berhemdarî ........ 116
» Tama Her Tiştî Bi Min Tal Tê Êdî ........ 117
◊ KOSAR SUBHAN REHMAN ........ 118
» Jiyanname ........ 118
» Helebce Û Razî Îşqêk ........ 119
◊ MEM BAWER ........ 123
» Jiyanname ........ 123
» Berhemdarî ........ 123
◊ Dîwanên wî ........ 123
◊ Wergerên wî ........ 123
◊ Gotinên muzîkê ........ 123
◊ Pirtûkên Zarokan ........ 124
» Peqikên Avê ........ 125
◊ HESEN NAZDAR ........ 126
» Jiyanname ........ 126

» Helebce ........................................................................ 127
» Helebçe û şanzeyî Sê .......................................................... 128
◊ ÎNCÎ EGÎD ........................................................................ 130
» Jiyanname ...................................................................... 130
» Berhemdarî ..................................................................... 130
» Helebçe ......................................................................... 131
» Ji Bo Helebçe ................................................................... 132
» Poşk ............................................................................ 134
◊ OMER KERÎM BERZENCÎ ............................................................... 135
» Jiyanname ...................................................................... 135
» Hewarêk Nemawe Bo Pêşû .......................................................... 136
» Qederî Xewnekan ................................................................. 145
◊ SEBRÎ VÛRAL ...................................................................... 147
» Jiyanname ...................................................................... 147
» Berhemdarî ..................................................................... 147
» Helebçe ......................................................................... 148
» Enfal ........................................................................... 150
◊ ZEYNEP YÛSFÎ ..................................................................... 152
» Jiyanname ...................................................................... 152
» Şewgarî Helebce wn .............................................................. 153
◊ EDNAN DOGAN ...................................................................... 155
» Kurtejiyan ..................................................................... 155
» Helebçe ......................................................................... 156
» Helebçe Me ...................................................................... 157
◊ BARÎ MEHDÎ ....................................................................... 158
» Şanzey Sêye ..................................................................... 158
◊ OCCO MAHABAD ..................................................................... 159
» Jiyanname ...................................................................... 159
◊ Çend fîlmên ku ji aliyê wî ve hatine Kurdîkirin: ............................ 159
◊ Albûmên wî: .................................................................. 159
◊ Pirtûkên wî .................................................................. 160
» Ev bû... ........................................................................ 161
» Min. . . ........................................................................ 162
» Min bibe ........................................................................ 163
◊ ÎHSAN BÎRGUL ..................................................................... 164
» Jiyanname ...................................................................... 164

» Berhemdarî ........ 164
» Kenê Qerisî ........ 165
◊ FATÊ TAŞLI TÛNÇ ........ 166
» Jiyanname ........ 166
» Helebçe - I ........ 167
» Helebçe - II ........ 168
» Helebçe - III ........ 169
» Helebçe - IV ........ 170
» Helebçe - V ........ 171
◊ SEYDAYÊ DILXWÎN ........ 172
» Jiyanname ........ 172
» Berhemdarî ........ 172
» Êşa Helebçe ........ 173
◊ MEHMET ŞÎRÎN BULGA ........ 174
» Jiyanname ........ 174
» Berhemdarî ........ 174
» Ez Zarok Bûm ........ 175
◊ NEZEHAT DOGAN ........ 177
» Jiyanname ........ 177
» Berhemdarî; ........ 177
» Helebçe ........ 178
» Helebçe ........ 180
◊ OMER DILSOZ ........ 181
» Jiyanname ........ 181
» Berhemdarî ........ 181
» Dîmena Reş Û Spî (Helebçe) ........ 182
◊ NECAT BAYSAL ........ 183
» Jiyanname ........ 183
» Berhemdarî ........ 183
» Paytextên Êşê ........ 184
◊ SULTAN YARAY ........ 185
» Jiyanname ........ 185
» Berhemdarî ........ 185
» Helepçe ........ 186
◊ A. BEDIR ........ 187
» Jiyanname ........ 187

» Berhemdarî ........ 187
» Goristaneke Winda: Enfal… ........ 188
◊ RONAHÎ FARQÎNÎ........ 190
» Jiyanname ........ 190
» Helebçe........ 191
◊ ŞEVGER ÇOLO........ 194
» Jiyanname ........ 194
» Wêneyê Helebçe........ 195
» Êşa Helebçe........ 197
◊ ŞÊXMÛS SEFER ........ 198
» Jiyanname ........ 198
» Berhemdarî:........ 198
» Helebçe........ 199
◊ DILDAR WELAT ........ 200
» Jiyanname ........ 200
» Berhemdarî:........ 200
» Helebçe........ 201

*Ji bo cangoriyên enfalê û Helebçeyê…*

# PÊŞEK

*“Zanînên herî baş û pak û biqîmet zanînên parzûnkirî ne.”*

Serdema ku em tê de dijîn wekî ‘Serdema Zanist û Teknolojî’yê tê binavkirin. Di qada teknîkî û zanistê de gelek pêşketin çêbûne û zanîn û zanyarî gihîştiye ber destê her kesên ku bixwazin bi dest bixin. Bi rêya internetê tora ragihandina zanînan ketiye hemû malan. Di derveyê îstîsnayan de cî û warên ku tora ragihandinê negihîştibê nemaye. Ev jî zanînê erzan dike û zanîn bi qasî serê pêçiyên destê mirov nêzî mirov bûye. Lê rastiyek jî heye; hemû tiştên ku di ser rêya tora ragihandinê re tên tev ne zelal in, tev ne rast in û tev ne pak û pêkan in. Ji ber ku zanînên tora ragihandinê ji hêla her kesî/ê ve dikare bê guhertin, bê zêdekirin û bê kêmkirin. Hemû kes dikarin bi riya tora ragihandinê “rastiya xwe” pêşkêşî her kesî/ê bikin.

Helbet rastiya her kesî/ê heye. Ango ‘rastî guherbar e.’ Lê rastiya giştî jî heye ku ev jî ji aliyê zanyariyê ve tê diyarkirin û civak jî dipejirîne. Ji ber wê jî hê jî ‘rastiyeke derbasdar’ heye ku ew jî “*rastiya nivîsê ya ku ji aliyê pispor û şarezayê mijara xwe ve hatiye parzûnkirin û sefandin*” e. Bi awayeke giştî mirov dikare bibêje ku ‘rastî’ di nava ‘rastiyên xwe’yî de her diçe wenda dibe û ev jî gengeşiyekê dertîne holê.

Nivîsa ku ji aliyê pispor û şarezayên mijarê ve hatiye nivîsandin, nivîsa sefandî û parzûnkirî ye. Ew ê nivîsê bi dirustî û bi rastî dikare rastiyan ji mirov re vebêje.

Me jî li ser vê rastiyê berê xwe da “rastiyên parzûnkirî” û me got “zanînên herî baş û pak û biqîmet zanînên ku li ser pelgên ku ji aliyê pispor û şarezayan ve hatine nivîsîn

in." Û me berê xwe da zanyariyê. Me got; "*Zanînên ku di nava rûpelên qirêjî yên dîrokê de veşarî mane, em wan ji nava tariya reşaşî derînin û pêşkêşî xwendevanan bikin.*"

Wekî Weşanên J&J; me heyîn û hebûna xwe li ser vê yekê diyar kir û me got; '*Em ê ji jêderên rastiyên parzûnkirî bi rê bikevin û dakevin jêwerên qada jibîrvekirinê.*'

Û me got; '***ziman***' û me got '***ferheng***' û me got '***zargotin***' û me got ***"perwerde"*** û me got "***pelgîdank***", û me got "***lêkolîn û lêgerîn***", û me got "***dîrok***"... Rastiyên zimanzaniyê, rastiyên ferhengzaniyê, rastiyên perwerdeyê, rastiyên pelgeyî, rastiyên lêkolîn û lêgerînî rastiyên gel yên ku dibin amûrên pêşveçûn û ramangeriya durist rastiyên parzûnkirî ne û giş hatine tesdîqkirin.

Li ser vê rastiyê me jî wekî Weşanên J&Jyê xwest ku em berhema bi navê "***Bîra Helbestê -II HELEBÇE***" ku ji aliyê nivîskar Mehmet Saît Arzû ve hatiye amadekirin çap bikin û pêşkêşî xwendevanên Kurdî bikin. Ev berhem ji helbestên 38 helbestkarên Kurd yên ku bi zaravayên Kirmanckî | Zazakî, Soranî û Kurmancî hatine nivîsîn pêk tê.

Em wekî WEŞANÊN J&Jyê bi vê berhema giranbuha dertên pêşberî xwendevanan û em dibêjin; "*Em ê xebatên xwe yên bi vî rengî her bidomînin...*"

Bi hêviya ku sûdewer be...

**11. 03. 2020 - J&J**

# PÊŞGOTIN

Hin hizir hene heta kû di bîra mirov de baş neyên gihêştin an jî hêzê di xwediyê xwe de nebînin nawelidin. Ev hizir jî ji wana ye ku demek dirêje difikirîm. Me îro ew hêza di xwe de dît û li ser vê xebatê gavek avêt. Weka hûn jî dizanin welatê me gelek êş û elem kişandiye. Cih nemaye ku Kurd lê nehatine kuştin, qetilkirin û nefîkirin. Li hember hemû zilm û zorê tekoşîn jî bê navber berdewam kiriye. Pê re şahiyên me jî li gor jiyana me rengîn bûne. Bi jiyan û têkoşîna pîr û dapîrê me, bi taybetmendiyê xaka me ya qedîm çandeke pir dewlemend derketiye holê. Lazime em xwedîtiyê li vê çanda giranbiha bikin, mafê wê bidinê û tiştekî di ser xin an jî bêyî ku xera bikin bigihînin zarok û neviyên xwe. Di heman demê de divê em dîroka xwe ya bi êş yên ji aliyê zalim û desthilatdaran bi gelê me daye jiyandin jî ti carî jibîrva nekin. Ji bo herdem bi me re bijîn, wenda nebe, divê êş û şahiyên me jî, lehengên me jî, rojên me yên taybet û her cûre çanda me jî qet bê xwedî neyê hîştin. Ev xebat jî ji van rastiya welidî. Li gor wê, qandê qaweta me bigihê û alîkarî û tevlîbûn çê bibe, bi sernavê “Bîra Helbestê” em ê her carê bi mijareke cûda derkevin pêşberî we. Daxwaza me ewe ku em bi rêya helbestê wêje ya xwe xurt bikin û ‘bîr’a xwe bi hemd dagirin. Da ku êşên me û bi giştî çanda me jî neyê ji bîr kirin. Ger ev xebata têrkarî yê ji wêje yê re an jî ji dîrokê re çêbike, ne tenê ez, emê hemû bextewer bibin. Lewra ev komxebateke û ne ya min bi tenê ye. Ji xwe li ser milê kesekî/ê bi tenê jî naçe serî. Loma divê em hemû haydar bin û ji vî karê qedîm nemînin. Dibe ku di hejmarên pêş de yên ‘Bîra Helbestê’ ez jî weka we tenê nivîskarek an jî

hew xwendevanek bim. Ez vê hêza di nivîskar û xwendevanên zimanê Kurdî de dibînim. Hêvîdarim ev kar û barê me, weke çemeke bê dawî herikbar be û bi hemû mijarên me yên girîng û taybet, li hemû xaka Kurdîstanê bigere û xwe bigihîne hemû mirovan…

**Mehmet Saît Arzû**

# DESTPÊK

Di Bîra Helbestê ya duyem de, ji ber ku em di nava rojên sih û duemîn salvegera komkujiya Helebçe û Enfal de ne, me ew mijar girt dest. Mixabin di dîroka me Kurdan de êş ji êşan girantir hene. Helebçe û Enfal jî ji ewan êşan yeke. Êşekî kûr û dirêj, êşekî ti carî naye cebirandin û nayê jibîrkirin. Loma em çi bivêjin wê kêm bimîne, em çi binivisînin wê lawaz bimîne, em çi bistirên û biqîrin wê dilê me sar neke û birînên me jî wê neyên kewandin. Dîsa jî jibona hevkarî û piştevanî ya bi gelê xwe re û berpisîyariya li hember dîrokê divê hewildanên me yên şîrove kirin û vegotina ev êşên me bidomin. Ji ber ku divê em dîroka xwe baş bizanin, da ku hêza me xurtirîn bibe.

Di vegotina ev êşa giran de emê nivîsa rojnamegerê hêja Seyît Evran bi we re parve bikin.

## Navê qirkirina Kurdan: Enfal

Kurd li welatê xwe timî hatin qirkirin. Hêzên mêtinger her ku Kurd qirkirin, ji xwe re hinceta 'serî rakirin' anîn ziman. Ji ber ku hêzên navneteweyî ev hincetên mêtingeran maqûl didîtin, qirkirina Kurdan ti carî nehate dîtin.

Di gelek serdemên dîrokê de Kurd hatin kuştin, hatin qirkirin. Bi tyabetî ji sedsala 19'an û pê ve, di dema raperînên Kurdan de yên li dijî parçekirina Kurdistanê û yên ji bo azadiyê, hatin qirkirin. Kurdên li her çar parçeyên Kurdistanê para xwe ji van komkujî û qirkirina wergirtin. Yên ji ber qirkirinê man hatin sirgûnkirin. Hêzên navneteweyî ti ji van qirkirin û sirgûnkirinê nedîtin. Yên ku qir kirin weke ku qir nekirine qebûl kirin.

Di salên 1980'î de qirkeran vê carê dest pê kirin ku bi çekên kîmyewî û gazên bi jehr, Kurdan qir bikin. Di demekê de ku şerê Iraq-Îranê didomiya, Saddam Huseyîn bi çekên kîmyewî êrîş bir ser bajarê Helebçeyê yê Başûrê Kurdistanê. Li gorî hejmara fermî 5 hezar Kurd, li gorî hejmara nefermî jî 18 hezar Kurd hatin kuştin. Di serî de DYE, hêzên navneteweyî ev êrîş weke qirkirinekê qebûl kirin, lê ti carî lêkolîn nekirin ku kê çekên kîmyewî daye Saddam Huseyîn ji bo li dijî Kurdan bi kar bîne.

Tê gotin, qirkirina bi navê Enfalê li Başûrê Kurdistanê pêk hat, Adara 1986'an dest pê kir, Hezîrana 1989'an temam bû. Enfal navê sûreyeke Quranê ye. Wateya xwe jî 'jinûve fethkirin' e. Enfal yanî qirkirina Kurdan, berî Helebçeyê dest pê kir. Lê belê bi Helebçeyê re kete rojevê. Ji ber ku qirkirina li Helebçeyê hate kirin, welê mezin û li pêş çavan bû ku êdî kesî nikarîbû ji nedîtî ve bê.

Enfala li dijî Kurdan, Ahmed Hesen Bekîr dest pê dike ku Saddam piştî wî bû desthilatdar. Ahmed Hesen Bekîr bi projeyên xwe yên gundên komî, di serî de Qendîl û Zap seranserê Behdînanê, gundên li Garê, Xakurkê, Xinêrê vala kir û gundî li kampên Hewlêr, Diyana, Silêmaniyê bi cih kir. Li Garê nêzî sed gund, li Behdînanê li herêma Zap û Geliyê zêdeyî sed û pêncî gund, li Geliyê Reş 50 gund, li geliyê Xakurkê sih gund, li Geliyê Xinêrê heyştê gund, li Qendîlê sed û pêncî gund hatin valakirin û gundî li kampan hatin bicihkirin.

Bi vê pêkanînê re ku sala 1978an dest pê kir, bi giştî 4500 gund hatin valakirin. Kurdên ku ji gundên xwe hatin derxistin û li kampan hatin bicihkirin, piştî demekê ji gundan reviyan û li deverên nêzî gundên xwe bi rengekî veşartî bi cih bûn. Beşek jê jî xwe li gundên li herêmên sînor ên Rojhilatê Kurdistanê û herêmên sînor ên Bakurê Kurdistanê bi cih bûn. Sala 1979'an piştî ku Saddam

Huseyîn bi darbeyê desthilatdariya Ahmed Hesen Bekîr hilweşand, Enfal hîn bi rêk û pêk domand.

Saddam Huseyîn, sala 1986'an vê carê Enfal bi rengê komkujiyên giştî meşand. Dema ku Saddam Huseyîn polîtîkayên Enfalê dimeşand di navbera Îran-Iraqê de şer diqewimî. Saddam sala 1986'an ji bo Kurdan li dijî Îranê bide şerkirin, di serî de eşîrên Herkî, Zêbarî, Bradost, Goran ji eşîrên li Başûr hemûyan tûgayên bi navê Fevc ava kir. Ev tûgah ji Deşta Heyatê, Xakurkê, Kelaşînê, Helgurd, Qendîl, Mamendê, Asosê dest pê bike heta bi Pencewînê li seranserê sînor bi cih kir. Saddam ku ji Kurdan tûgay ava kir û bi Îranê re da şerkirin, malbatên wan jî qir kir. Di heman salê de Enfalê yanî qirkirinê dest pê kir.

Qirkirina Kurdan a li Başûrê Kurdistanê ku ji aliyê rejîma Baas û dîktator Saddam ve hate kirin, berî Helebçeyê dest pê kir. Sala 1986an dest pê kir û bi rêk û pêk li gelek deveran bi çekên kîmyewî komkujî hatin kirin. Qirkirin li Deşta Hewlêrê, Geliyê Balîsanê, herêma Sergelu-Bergelu ya Silêmaniyê, Şanexşê, Helebçeyê, Qeredax, herêma Germiyanê, li Ekserê pêk hat û sala 1989'an temam bû. Li gelek ji van herêman çekên kîmyewî hatin bikaranîn. Di encama vê qirkirinê de 210 hezar Kurd hatin kuştin. Piraniya 210 hezar Kurdên hatin kuştin, li herêmên Ereban bi rengekî komî hatin veşartin. Agahî hîn jî ji 182 hezar Kurdên hatine kuştin nîne.

Piştî ku bajarê Helebçeyê bû hedefa çekên kîmyewî, yekser kete rojeva dinyayê. Bi vî rengî di qeydên fermî de jî cihê xwe girt. Yek ji herêmên ku qirkirineke giran lê hate kirin, Germiyan bû. Ji ber vê yekê, 14'ê Nîsanê roja pêkhatina qirkirina li Germiyanê li Başûrê Kurdistanê weke roja qirkirinê bi fermî hate ragihandin.

Enfal ji bo Kurdan ne tenê komkujiya li bajarekî, li nav-

çeyekê, li bajarokekî ya jî li gundekî ye; ew polîtîkayeke demdirêj e. Tevî li gorî dîroka fermî Enfalê sala 1986’an dest pê kir û sala 1989’an temam bû, lê di rastiyê de sala 1978an dest pê kir û hîn jî didome. Bi belgeyên li ser komkujiyên li Helebçe, Geliyê Balisan, Sergelu-Bergelu û gelek herêmên din ispat bû ku ev polîtîkaya komkujiyê hîn jî didome.

**Seyît Evran**

**Çavkanî:**

https://anfkurdi.com/kurdistan/nave-qirkirina-kurdan-enfal-112378

# GORISTANA KU 5 HEZAR MIROV LÊ NE: HELEBCE!

Mirovahî di encama şerê sedsala 20’an de bû şahidê komkujî û trajediyên ku ragirtina wan giran e.

Di vê pêvajoyê de çekên pêşketî yên teknolojîk hatin çêkirin û di vê sedsalê de ev li ser mirovan hatin ceribandin. Dema ku hate dîtin ev bû sedema karesatên mezin di sedsala 20’an de peymanên navneteweyî hatin îmzekirin, yekîneyên kontrolê hatin danîn. Helbet van nekarîn ku şer bidin sekinandin. Ji ber sedema hesabên polîtîk ên di navbera welatan de û ji ber dîplomasiya berjewendiyê ev trajedî çêbûn.

Pêvajoya Ber Bi Qirkirinê Ve

Kurd di sedsala 20’an de rastî li karesatên mezin hatin. Tenê tişta ku Kurdan di dema dîktatoriya Seddam Hisêyn de li Iraqê jiyan jî ji hêla dîroka mirovahiyê ve birîneke kûr e. Polîtîkaya rejîma Bees a ku salên 70 û 92’an li ser Kurdan kirî bûbû sedema trajediyeke mezin. Li Enfalê û Helebce rûpelên şermê li dîroka mirovahiyê zêde bûn, li Helebceyê jî ev bi salan e ku ji bo ku rabe ser xwe têdikoşe.

Şaredarê Helebce dibêje nifûsa Helebce 120 hezar e. Helebce bajarekî şîrin e ku li rojhilatê Başûr e û sê aliyên wê bi çiyayan pêçayî ye. Demsala Helebce nerm e, çemê Sîrwanê deştên derdora Helebce av dide. Kurdên bajêr bi Hewramî diaxivin, ev jî nîşan dide ku ji deverên ku Soranî diaxivin ji Kurdan xwedî dîrokeke dî ne. Tevahiya dinyayê Helebce ji komkujiya Helebce a 16’ê Adara 1998’an dizane ku Seddam Hisêyn bi çekên kîmyewî êrîş bi ser Helebce de anîbû. Li goristana Helebce 5 hezar gor

hene. Di ser komkujiyê re li gel ku 29 sal derbas bûne jî hê jî şopên komkujiyê neçûne. Ev komkujiya ku her sal bi merasîman tê bibîranîn çawa pêk hatibû?

Wê demê Iraq di rêveberiya Seddam de bû, nîvên salê 80'yî li hêlekê bi Iranê re şer dikir û li hêla dî jî li dijî Kurdan. Wê demê PDK û YNK li dijî rêveberiya Seddam bûn. PDK û YNK bi ''Eniya Kurdistanî' gihaştin hev û SİIêmanî kirin jêr kontrola xwe. Seddam li dijî vê ji bi navê Enfalê li dijî Kurdan qirkirin da destpêkirin.

Pêvajoya Enfalê bi şerê Iraq û Îranê bileztir bû. Ji ber ku du welatên ku şerê hev dikirin dixwazin Kurdan li dijî hev bikin kozê siyasî. Ji bo ve jî ber bi 1986'an ve rejîma Bees ku li herêma Kurdan li dijî Îranê qels mayî hewl da ku Kurdan bi temamî tine bike û wan ceza bike. Ji bo vê jî Elî Hesen el-Mecîd ku weke ''Eliyê Kîmyewî" tê naskirin hate peywirdakirin. Pêşî zemîna qirkirinê di hêla yasayan de hate danîn. Gelek herêmên ku Kurd lê dijîn kirin 'herêmên qedexe'. Hemû mafê hiqûqî û yasayî ya şêniyên vir hate betalkirin. Hate diyarkirin kesên ku li 'herêmên qedexe' dijîn sivîl jî bin wê miemeleya 'pêşmerge'yan bi wan were kirin û werin kuştin.

Mirina Ku Bi Bêhna Sêvê Hatî

Li Helebceyê nêzî 76 hezar kes dijîn. Li jora Helebce, nêzî sînorê Rojhilat bajarokê Hurmalê hebûn. Ev du dever jî ji bo Iraqê cihên stratejîk bûn. Dema ku şerê Iraq û Îranê dom dikir, 1998'an, 15'ê Adarê artêşa Iranê bi ser Iraqê de de hat. Artêşa Iranê û pêşmergeyên Talabanî Helebce derbas bikin û bi kelekan çûne başûrê gola Derbendîxanê û ketin rêya Silêmanî.

Hemû xetên ragihandinê hatibûn birîn û ti têkiliya herêmê bi Iraqê re nemabû. Li vê herêmê 4 hezar leşkerên Iraqî hebûn. Piştî ku artêşa Îranê ev qasî nêz bû

û herêm kete kontrola Kurdan rejîma Beesê qurf pê re çêbû. Sedam ji bo ku pêşî li artêşa Îranê bigire careke dî fermana çeka kîmyewî da Mecîd. Yekîneyên Iraqê bi serektiya Meclîd 16'ê Adarê êrîşa herî giran a Enfalê pêk anî. Pêşî êrîşa hewayî hate kirin û piştre bi tang û topan êrîş pêk hat. Lê şêniyên Helebce pir netirsiyan. Êrîş, ji ber şerê ku ev bi salan e dom dikir, parçeyek ji jiyana xwe didîtin. Ketin malên xwe û sikeftan.

Lê hay ji taktîka artêşa Iraqê nebûn. Artêşa Iraqê jî pêşî êrîşa bi çekên konvansiyonel pêk anî da ku camên wan bişikin. Bi vê re rê li ber operasyona duyê vekirin. Piştre jî çekên kimyewî şixulandin. Ji ber ku cam şikestibûn ên ku ketibû hundir jî xilas nebûbûn. Dema ku bombekirina duyan dest pê kir bêhnek berbelav bû. Gelêk kesên ku nemirin fêhm nekirin bê ka ev 'bêhna sêvan' çiye. Jixwe wextê wan jî ku vê watedar bikin nebû. Dema ku bêhn kişandin yek bi yek dimirin. Hem mirov û hem jî ajal..

Di bombekirinê de bombeyên ku gazên xerdel û sarînê bi kar anîbûn. Ên ku gaz hilmijandin çermê wan şewitîbû, fetisîbûn. Hin li ber deriyê mala xwe, hin li ber baxçe, hin li din dîwarekî, hin ji şiverêyekê ku bi hêviya xilas bibin baz dabûn.

Who: Heta Niha 43 Hezar Kes Mirin..

Piştî vê êrîşa kîmyewî li Helebce ji 5 hezaran zêdetir Kurd mirin û ji 10 hezaran zêdetir kes jî birîndar bûn. Li gorî Rêxistina Tendiristiyê ya Dinyayê (WHO) hijmara miriyan zêdetir e. Li gorî WHO di êrîşa kîmyewî de li Helebceyê heta niha 43 hezar û 753 kes mirine, 62 hezar û 200 kes jî seqet mane.

Li Helebce di dema Enfalê de kûçikan gelek termên mirovan xwarin, gelek mirov li çolan li nav xîzê hatin veşartin, di kampên komîserhev kirinê de gelek hovîtî hatin

jiyîn. 16'ê Adarê dema ku gelê Helebce rastî li komkujiyeke herî giran hatî, neçariya xwe jî jiyan.

Dayika Helîse: Weke Meydana Mehşerê Bû..

Dayika Helîsa ku li gundê Anap ê Helebceyê di jêrzemîna mala xwe de xwe veşartî û sax mayî, du çavên wan nabînin wiha behsa roja hovîtiyê kir:

"Dengê helîkoptêran hat, piştre jî dengê balafiran. Dengê bombeyan ji her deverê dihat. Piştî her bombeyê bêhneke genî dihat. Piştre bêhna wê dibû weke bêhna sêvan, xweş dibû. Min li derve nerî. Pir bêdeng bû lê ajal dimirin. Bizin û meh dimirin. Çavên me dişewitîn û hêstir ji çavê hine ji me dihatin. Me biryar da ku birevin. Em ber bi cihê avê ve çûn. Weke ku em dibeziyan bilez me hilm distand. Pelên daran diweşîn. Li her deverê mirov dimirin. Dema ku zarokan nema dikarîn pêştir biçin, dê û bavên wan zarok dihiştin û diçûn. Yixtiyar jî dihiştin û diçûn. Dibeziyan, nedikarin hilmê bistînin û dimirin. Weke roja mehşerê bû û yên ku hal di wan de mayî diqîrîn."

Li goristana Helebce dema gor hatine vekirin, di hin goran de 1500, di hinan de 400, di hinan de 80 term hatine veşartin. Ji bo vê jî piştî komkujiya Helebce ku 5 hezar kes lê hatibûn kuştin, li bajêr, em dikarin bibêjin yek gor e ku 5 hezar kes tê de hatine veşartin. Di çarîka sedsala 20'ê de 1994'an komkujiya Raunda, 1995'an a Boşnakan û 1988 a Helebce ya li ser kurdan bûne êşa hevpar a mirovahiyê.

**Yaşar Aksu**

**Çavkanî:**

*https://anfkurdi.com/kurdistan/goristana-ku-5-hezar-mirov-le-ne-helebce-80706*

# HELEPÇE

*Tu bi fêkiyekê hate xapandin!*
*Sêv dane te,*
*Bêhna wê jî kirin jehr û bi ser me de barandin.*
*Lê, tu pir beriya me di xew re çû,*
*Bi zanebûn an jiber navê sûreya quran a xwe! …*

# ŞÊRKO BÊKES

## Jiyanname

Di 2ê Gulana 1940î de li bajarê Silêmaniye yê hatîye cîhanê. Lawê helbestvanê navdar Hozan Faiq (Fayeq) Ebdila Bêkes û Şefîqe Seîdî Wesfa Hesen bûye.

Şêrko Bêkes xwendina xwe ya bingehîn û navîn li Silêmanî û li Bexdayê temam kirîye.

Bêkes ji 17 salîya xwe ve dest bi nivîsandina helbestan kirîye û cara pêşîn helbestên xwe di kovara Jîn li Silêmaîyê belav kirine.

Li Bexdayê zanîngeh qedandîye û kitêba xwe ya yekem a bi navê Tirîfey Helbest li vî bajarî di sala 1968'an de çap kirîye. Pirtûka wî ya duyem di sala 1969'an de çap bûye.

Şêrko Bêkes di navbera salên 1965-1987'an de pêşmerge bû û di heman demê de di radyoya Dengê Şoreşê de dixebitî.

Piştî têkçûna şoreşa İlona 1974'an, hukumeta Îraqê Bêkes şand sirgûnê. Di 1979'an de Bêkes dîsa vedigere Silêmanîye yê.

Şêrko Bêkes di sala 1984'an de beşdarî serhildana li Başûrê Kurdîstanê dibe. Di sala 1986'an de li Îtalya û li Swêdê dibe penaber. Li Swêdê bû endamê Komaleya Nivîskarê Swêdê û bû endamê PEN a Swêdî.

Di 1991-1992'an de li yekem kabîneya hukûmeta herêma Kurdîstanê dibe wekîl û dibe wezîrê reweşenbîrîyê. Piştî wezîrîya du salan ji ber nedemokratîkbûna parlemenê îstifa kir û vegerîya Swêdê.

Şêrko Bêkes helbestên xwe û heta salên dawîyê giranîya karê xwe bi zaravayê Soranî dinivîse.

Bûyerên sala di 1960-61'î de zêde li ser jîyana wî bandor dike, helbestên wî gavek xweşkeys û pêşvetir dibe.

Di 14ê Gelawêj/Tebax a 1987'an de Kûliba Panê ya Swêdê xelata Tucholsky dide wî. Bi xelata navneteweyî Şêrko Bêkes navê helbest û wêjeya Kurdî bilind dike û digîne cîhanê. Di sala 2001'î de li Silêmanîyê, ji Navenda Kultrî Xak, xelata 'Pîremêrd' girt.

Şêrko Bêkes, berhemên xwe bi awayê pîvana serbest, nûjen dinivîse. Heta ji destê wî tê ji pîvana erûz dûr dikeve û wiha dibêje: "divê senetkar (hozan) bi pênûsa xwe, xwe qeyd nekin û nekevine zindana erûzê."

Heta niha 20 kitêbên wî yên helbestan hatine çapkirin. Bi gelek zimanan (yunanî, tirkî, erebî, îngîlizî, fransî, almanî û swêdî) hatine wergerandin.

Şêrko Bêkes piştî sê meh nîva hatibû dermankirin, di 4'ê Tebaxa 2013'an li nexweşxana Karolîska ya Stockholma Swêdê jiber nexweşîya pençeşêra pişikê çûye ser

dilovanîya xwe. Li parka Azadî ya Silêmanîyê veşartîye.

Berhemdarî

-Tirfey Helbest, helbest, 1968

-Kejwey Girgan, helbest, 1970

-Kawayê Hesinker, şanoname, 1971

-Min Tînuyetîm Be Gir Eşekê, helbest, 1973

-Asik, şanoname, 1978

-Kaziw, helbest, 1978

-Dû Sirûdûî Şewî, helbest, 1978

-Pîremêrd û Zerya, wergera ji erbî, roman, 1982

-Rûbar, çîrok, 1984

-Helo, helbest, 1985

-Awêne Biçûnekan, helbest, 1986

Çavkanî:

SAGNİÇ Feqî Huseyn, Dîroka Wêjeya Kurdî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2014

BÊKES Şêrko, Hemû Helbest, Bi wergera Muhsîn Özdemîr û Sîrwan Rehîm, Ronahî, Amed, 2012

BÊKES Şêrko, Ji Başûr Barana Helbestê, Bi wergera Muhsîn Özdemîr û Sîrwan Rehîm, Ronahî, Amed, 2014

## Helebçe

çardehê mehê bû
li ser goyje’yê, bayê pênûsa min firrand
dema ku min pênûs dît û pê nivîsî
ref bi ref peyvên min firriyan

pazdehê mehê bû
sîrwanê pênûsa min bir
dema kum in pênûs girt û pê nivîsî
helbestên min bûn masî

şazdehê mehê bû
axxx şazdehê mehê
dema ku şarezûrê pênûs ji min girt
dema ku pênûs j imin re vegerand û min pê nivîsî
weke helepçe
pençeyên min zuwa bûbûn

## Hawara Enfalê

Çend hawar û qîjînek, di nava enfala ku di havîna sala 1989an de gihane min

1.
tenê ew dem
ku xwedê tê da raza bû
heqîqet tê de raza bû
sala enfalkirina me bû

2.
li wî aliyê dinyayê
dema ku qurbanî dîsa radibin
diçin pêşiya erşê xwedê û
bi hev re xwe ditekînin
toza ku ji wan radibe
ji serî heya binî erşa xwedê
rû digire

3.
dirokek e
hawara me ewqas tenê ye
birîna me ewqas bêkes e
tenêtî ji me aciz e û
bêkesî jî j ime dilteng bûye

4.
dibêjin jineke
germiyana vî welatî
bûye germaya bêwar û
bazeke dîn
dibêjin
kesên wê bibînin guhdar dikin û wê dibêjin
gelek caran min tişt wenda kirine
carekê du mirîşk
carekê du çûk
careke din du gustîlk
li pey wan min nav mala xwe
mala cîran û van rê û banan digeriyam
lê niha min çavên xwe wenda kirine
min nêrîn û bihîstinê wenda kiriye
destên min ji min dizîn
rihê min birin
jiyan ji min dizîn
ez nizanim
li ku derê
li wan bigerrim

5.
ji ber ku ew dûr in
çavek nîn e ji min ve nêzîk
ji ber ku ew gelek tîn in
avek nîn e ku ji min dûr nebe
ji ber ku ew çilmisî ne
tiştek nîn e di nav min de kesk be
ji ber ku ew nediyar in
ez jî ne diyar im

6.
ez rûniştî me
li pêşberî daretûya binpembe
çivîkek tê û li ser darê disekine
di dengê wê de nûçeyek heye
-hê jî dijîn
silavên wan hene
ez sekinî me li pêşberî ewrê
hundur reş û
ewr tê ser serê min û gurmegurmê dike û
nûçeyek pê re ye
-ew di cihekê de ne
ez jî nikarim bi ser wî cihî re derbas bibim
ez dirêj bûm û bayeke gêj a
kinc biax û toz
digihîje cem min û
nûçeyek pê re
-hawar û qîjîn
ez kerr kirim û
bi şev janên wan hemû jinan
ez korr kirime
va ye tevî wê rewşê ez giha me cem te

7.
dinyayê dipîvim bi bejna
vê xema xwe
ji kur ve an ji çi kesî
hêrsekê ji min re şandibe
wê dixim çavê ruhê xwe û
heta hetayê wê diparêzim
kesê ku gotinekê jî kiribe
ji bo vê qirrkirin û zordariyê
ez sed peyvê hezkirinê
jê re dişînim
lê ku xwedê û pêxember be jî
xwe ji dîtina min dabe aliyakî
ne wî dibînim û
ne jî tu carî li wî guhdarî dikim

8.
enfal
enfal
ger ev ava ku hatiye kuştin
yek bi yek em wê venexwin
ji evîna çavkanî û
ji evîna avê fêm nekin
enfal
enfal
ger ev rengêku hatiye kuştin li xwe nekin
ger vê hewaya xeniqî hilnemêjin
kesek ji me jî najî

9.
di wê salê de
kûçikên sehraya jêrîn
gurên sehraya jêrîn
bi zindî zindî
ewqas kurd xwaribûn
xwe ji bermayiyên kevin
ê teyr û laşê mirî û kevin
dide alîkî di wê salê de

10.
heya ji min were
vê dûxanê dirêj dirêj dikim
ji bo ku çavên pêşerojê
tije ji avê bikim heya ji min were
vê hawarê dirêj dirêj dikim
ji bo ku guhê pêşerojê
tije ji guvîna deng û
ji şûşeya hûr a şkestî ya kederê bikim

11.
dema ceh kuştin
ji kerba wê, çiqas kulîlik hebûn ketin û ji xwe çûn
dema kulîlk kuştin
ji kerbê wê çiqas teyr hebûn korr bûn
dema teyr kuştin
ji kerba wê hemû ji hiş ketin
û hin ji wan jî mirin
dema dar jî kuştin
wê demê êdî çiqas helbest hene
ji firrîn û ji bask ketin

12.
yekem şev bû
ji nav qûma başûr de
destek derketibû derve
hê jî zingezinga bazin ji destî dihat
hê jî hine di nav dest de dikeniya û
gustîlk di tiliyê de distrî
yekem şev bû
ji nav qûmê destek derketibû derve

di wê şevê de
nava kefa destî
bûbû dev
ew jî tenê ji bo hawarekê
ku her di rê de dimir û
nedigihîşt guhê jorê
çima ey xwedê

# Dr. REFÎQ SABÎR

## Jiyanname

Dr. Refîq Sabîr; Qadr le salî 1950 le şarî Qeladizê/ Parêzgey Slêmanî, ledayk buwe. Xwêndinî seretayî, nawendî û amadeyî le wê tewaw kirduwe. Le salî 1970-1974 le Zankoy Bexda, Kolêcî Edebyat, beşî Ziman û Edebî Kurdî xwêndûyetî. Le hawînî salî 1972 ta eylûlî 1978 wek rojnamenûs, le rojnamey Bîrî Niwê, le Bexda, karî kirduwe. Le salî 1976 yekemîn komele honrawey benawî *"Pişkokan Degeşînewe"* le Bexda bilaw botewe. Le seretay salî 1981 le şax legel komelîk Nûser Yekîtîyî Nûseranî Kurdsitaniyan dade meziranduwe, herwa govarî *"Nûsey Kurdistan"* yan derkirduwe. Le hawînî salî 1982 duway peregirtinî şerî brakujî, Kurdistanî becê hêştuwe û çotewe bo bulgarstan. lewê le ekadêmyaî zaniste komelayetîyekan, beşî felsefe, drêjey be xwêndn dawe. Le hawînî salî 1987 brwanamey duktoray le felsefe wergrtuwe. duktornamekey be nawî (rolî kultûr le pêkhênanî hoşyarîî neteweyî kurd) nûsîwe. Le nawerastî salî 1989 wek penaber le wlatî swêd nîştecê buwe.

Le beharî salî 1991ta seretay salî 2001 legel berêzan Dr. Kemal Mîrawdelî, Haşm Koçanî û Karwan Ebdûlla, govarêkî kultûrîyî werzîyan be nawî *"Rabûn"* le Swêd derkirduwe. Le salî 2006 le slêmanî serokî melbendî kurdolocî buwe. Le salî 2001 xelatî edebîî (klas dî vîldê) î swêdî pê bexşra. eu xelate edebîye dû sal carêk be nûserêkî byanî dedrêt, ke berhemekanî be swêdî blaw krabnewe. Le salî 2007 xelatî edebîî (mamosta îbrahîm ehmed) î le slêmanî pê bexşra. Honrawekanî refîq sabîr bo çendan zmanî byanî tercume krawn, lewane erebî, farsî, înglîzî, frensî, swêdî, danmarkî, neruycî, holendî û îstonî. Le salî 2009-2001 endamî perlemanî Kurdistan buwe. duay dû sal destî le karekey berdawe.Êsta (2019) le Swêd dejî.

# Berhemdarî

## Honrawe:

Pşkokan degeşînewe, bexdad 1976
Rêjne, mhabad 1979
Sûtan leber baranda, lenden 1985
Werzî seholbendan, lenden 1987
Lawkî helebce, beyrut 1989
Karwansera, swêd 1990
Werzeberdîne, elmanya 1992
Dîwanî refîq sabîr, bergî yekem, swêd 1993
Awêne û sêber, swêd 1996
Jwanî rûnakî, swêd 1997
Rûnbûnewe, swêd 2001
Be tenya cêy mehêln (sercemî şî'rekan) çap û blawkirdinewey renc, slêmanî 2007
Raz û guman (sercemî şî'rekan) çap û blawkirdinewey renc, slêmanî 2007
Dîwanî refîq sabîr bergî yekem û duwem, pexşxaney xezelnûs, slêmanî 2014
Koy berheme şê'rîyekan, pexşxaney mang, bane 2017
Euynname, pexşxaney mang, bane 2017
Zorbey komelehonrawekanî çwar ta şeş car çap krawnewe.

## Lêkolînewe

Berew mêjû, swêd 1991
Împratoryaî Im, swêd 1998
Kultûr û nasyonalîzm, swêd 2002
Êraq bedîmukratîkirdin yan helweşandnewe, slêmanî 2005
Bestandardkirdinî zmanî kurdî, slêmanî 2008
Rwanîn le bulêlda (utuwêz) , pexşxaney mang, 2010

## Lawkî Helebch

Be tenya cêy mehêlin
Emşezryan deyçênêt
Temu mj daydepoşêt
Mangeşeu deyrfênêt
...
Geruuy be gzng terken
Zamekanî be şîlan
Be goranî daypoşn
Yan be sewzîî darstan

Serî be şepolan ken
Ba em şewe rayjênêt
Balay le hewr bigeyrin
Bruske– ba – deçênêt

Be tenya cêy mehêln
Mindalêkî lasare
Şar berdebaran dekat
Mang dekat be kolare

Sware ç şoreswarêk
Espî hetaw zîn dekat
Be goranî u tîşku maç
Ser zemîn berîn dekat

Ba kejawey le gula bêt
Yan le pelkezêrîne
Zemawendî xwên degrêt
Em şew paşay evîne

Aşqêkî lasare
Bruske– ba – deçênêt
Be tenya cêy mehêln
Mangeşew deyfrênêt.

# EZÎZ DERDAN

## Halebçe

Bira, bê ez torê yew meselaya dergi vaco
Meselayêk ke koy pey heliyay
Dar û birr pey bermay
Roc pey şermaya

Jehr asmên ra vara
Qefelna asmênî maran û dimaşkilan

Bira, bê ez to rê yew meselaya dergi vaco
Gedan xwu rê kaykerdîni awi di
Gedey ki paşta marda xo ra beste bî
Gedey ki deste pêrdê xo girewtbî
Cinîyan rişta rîştê
Cinîyan nan tenuri ra daynê
Ê zî sey min û to bî
Huyanê
Bermaynê
Peşmenîyaynê
Yarî kerdinê

Jehr vara asmênan ra
Verî kezeba înan veşay
Badî qelebîyay cadê xo di
Qedeyê gengulay hewn di mendî
Heton-heton
Leşay merdiman veşay sey kila adirî
Qedey fekakerde mendî
Desmali destê veyvekon di mendi
Huyî zeredê ciwûnikon di mend
Erd û asmên bermay

Jehr asmên ra vara
Keyeyî mendî bêwayîr, bêsermîyon
Cenî û comêrdî pêro pêser ra ginay
Ne nalayîşêk ne vengêk
Cadê xo di mendî bêziwan

Bira, bigoştari mi ra
Jehr varaynê asmên ra
Maran û dimaşkilan asmên qefelnabi bira

**Çavkanî:**

Newepel, Hejmar 2 | Rupel: 3

# EHMED HUSEYNÎ

## Jiyanname

**Ehmed Huseynî;** di sala 1955an de li Amûdê ji dayik bû. Amûdê bajarekî Kurdistana Başûrê Rojava ye. Huseynî dibistana seretayî, navendî û amadeyî li bajarê Amûdê qedand. Piştre li Zanîngeha Şamê ya Sûriyê beşa Felsefeyê qedandiye.

Hikûmeta Sûriyê nehişt ku Ehmed Huseynî bi dîplomeya xwe bixebite. Ew neçar ma ku karên ne li gorî xwe bike. Lewra Huseynî jî mîna gelek xortên kurd berê xwe da Ewropayê.

Huseynî di sala 1989an de çû Swêdê. Niha jî li Îngilistanê dijî. Gelek pirtûkên Ehmed Huseynî hatine çapkirin.

Di sala 2002yan de berhemên wî yên giştî yên bi navê Dîwan ji aliyê Weşanxaneya Avestayê ve hatin çapkirin. Di dîwana wî de beşeke mezin ji berhemên wî hene.

Sala 2001ê, di Medya TV de, bernameya 'Sîmirê Tavsorkê' û di sala 2005an de di Roj TV de, bernameya 'Dengvedana Peyvê' pêşkêş dikir. Ji destpêka sala 2013an di Ronahî TV de, bernameya 'Şeva Hicranê' pêşkêş dike.

Helbestvanekî navdar ê kurd e. Wî bandoreke mezin li helbestvanên ciwan kiriye.

## Berhemdarî

* Mistek ji şîna bêcir, Stockholm, 1990 Weşanên Komeleya Jinên Kurdistanê
* Bi xewna we pênûsê dilorînim, Stockholm, 1993, Weşanên Jina Nû
* Rono û sirûdên bêrîkirinê, Stockholm, 1994, Weşanên Jina Nû
* Sîriskên hesinî  (Selîm Berekat) Wergerandin, Stocholm, 1997, Weşanên Apecê
* Bazbend, Kewname, Stocholm, 1999, Weşanên Apecê
* Dîwan  (Berhemên Giştî) , Stenbol, 2002, Weşanên Avestayê
* Bajarê Dirinde, 2003, Weşanên belkî
* Çend Dîmenên Xemgîn ên Kurmanciya Nivîskî 2004, Weşanên Aram
* Ronoya (Nûrîstan) , Amed, 2011, Weşanxaneya Belkî
* Navekî Kuştî Ji Navên Te Yên Kesk Bûm, Helbest, Amed, 2012, Weşanxaneya Ronahî
* Berhemên Giştî I-II, Helbest, Amed, 2015, Weşanên Aram

## Goristanên Teng

*Bo Helebçeya şehîd!*
*"Şîniyên xwe yên giranbuha bi girî tar û marn ekin!"*
*Tembiya cotkarekî Kurd*

Li ser textê çiyan
Bûk bû…
Di hêlîna biharê de
Di hişê kevir de
Çûk bû
Gula heft ber bû,
Lêv tenik
Çav bi xewn
Por aza bû
Gerden ji alal û awazan bû.
Maçek min lê bû,
Maçek bi lez
Şipya lê,
Xerdela bê ol
Lêvên min birîn
Û berya wan,
Bi sêva xelatî tevî şa bû…
Kir hawar,
Me xwe pê dada…
Newroza xatirxwestinê ye
Cejna mirinê ye
Û… me hêvî di xwe de bada…

Axîna wê,
Agir, di şeva Zerdeşt de vemirand.
Birîna wê,
Xwîn, di çermê Xwedakî çayî de tewirand.
Movikên demê,
Diyarî şewata bê dûman dike,
Evînê ji ser zimanê hildike.
-şerpeze
-bîn teng
-toz girtî
Xewna tenik ji çavên "Leylayê" radike…
Xwas mîna pinpinîkê
Bê şal û şap!
Can sivik mîna hechecîkê
Ji bihara reş direve…
Tariyê distirê!
Ji stêrkeke geş dikeve…
Pencereya girî derbas dike!
Nema şîrê çîyan
Ji berfê nas dike!

Ji demsalên kesk
Bende maça xwe me…
Lê lê sêvê!
Zivistan be,
Li ser destên te diçilmisin.
Havîn be
Di gerdeniya te de diqurnisim
Û salên şor tên!
Bê heyveke şermînî
Bê hevdîneke nermînî
Bê şadî û çandin
Tev şîn û çirandin,
Û bi ser de!
Em dibêjin Helebçe bû,
Navik û cî bû…
Gopal û rêwî bû…
Gepa nan û birçî bû…
Firek av û tî bû…

Tarîbûn mijankê welatê min kil dike.
Baskên bihara birîndar
Nêçîra kewê şareza.
Nalîna bi çar çavkanî
Bindestiya bi qeremûşk
Jîna gergerînok
Taya mirinê û çend bîhok
Rêçên azadiyê bi mijê boyax dikin…
Sînga rojhilat bi maça min dax didin…
Hezar dijmin
Ji dara xwîna min tên weşandin.
Berî didin
Asêbûna nifirê
Vezilandina şevnemê
Li ser eniya porkura min.
Berî didin
Dîwarê bêdengiyê
Sema agirê min,
Hinarkên kulîlk û çivîkan,
Germ dikin
Bi rondikên Helebçeya min.
Li dor kezeba wê kevz digre
Mûzîka xweriste.
Kom dibin pêlên tevzînokê…

Bo wê serê çiyan dişike
Bo wê çira rêwiyan dişike
Bo wê, diçirise, li ser tava rokê
Xwîna kevokê…
Xuşexuşa çeman pûç dibe.
Jena dilê çiyan radiweste.
Û Helebçeyê
Bê dest e
Xwe davêje çepera jînê,
Xwe davêje
Genîbûna birînê…
Xwe davêje,
Dilê Memo diguvêşe…
Gavên Siyamend bi ser xwe de dikêşe…
Biskên Şêrînê
Pizota Zînê dimêje
Xwe davêje perya Ferhadê hunermend
Xwe davêje, qişikên evînê
Û vediciniqe!
Maça min û peymana zemînê têne bîra wê

Helebçeyê û dawiya şevê
Bi hev re zîz bûn…
Giyanê wê
“Ezraîl” û diranê wê
Bi ser hev de xwîz bûn…
Li nik sipîka çavê wê
Ro şerpilî.
Tava xweşiyê haş bû
Lehiya reşiyê ser û kaş bû
Stranên baranê
Zengilê berana êvarê
Xwe spartin qurmê hinarê
Bazî li zêweyê
Hêlînê dipekîne…
Serçavka Qeladizayê
Bi hêrs direvîne.
Şev bê dê ye!
Li derveyî demê ye!
Hênikahiya bayê sibê ye!
Dil li ser balgeha kîjan kêrê ye?
Berê rokê li kîjan gorê ye?
Û bareş xwe li ba dike,

Pênc hezar gul.
Pênc hezar peşkên baranê
Ji xewnan çîyan şiyar dike…
Û Bavê Tûjo
Ji esmanê şehîdan direve!
Û Helebçeyê
Nûxuriya çiyan
Ji zikê kevir
Ji ava gulan têt herikandin…
Bi mekyaja kîmya nûjen
Têt xemilandin…
Bîna wê ji çermê me
Ji maça min difûre
Cîhan pêl axê dike
Dişikim!
Bi navê dîktatoran
Bi azaa deyûz
Dibawişkim!
Û jena dilê min bi ser
Pêşanîka Helebçeyê de
Têt reşandin…
Rût…

Li ber tîna agirê me
Serê riman ji xwînê dişon…
Her tiştê xweşik talan dikin
Hemî sibehên nazik bêcan dikin
Xwe fêrî navê şûr û topan dikin
Û Helebçeyê
Lêvên xwe ji nêrgizê
Ji tava rokê bernade…
Ku ne li ser memikên berbangê be
Tiliyên xewnê ranade…
Ceng bo wan e!
Maç oksejêna Helebçe ye!
Û ji govenda seqemê nareve…
Ji guregura mirinê
Ji zindana çîyan
Ji ser pîyê ewran nalive
Doza wê maç e
An mazûbanê wê
Xerdel e, sêdar û xaç e

Esmanê şîniyê têt vegirtin,
Konê reş, porê Helebçeyê
Şil dike.
-Paşmêr
-Dîroka şêlû.
Bi rûpeleke reş
Ararat dinixumînin
Nehişyê maça bêtirs im
Li hember mirinê şox û girs im
Û tê lorandin:
-Bi bayê ber tavê.
-Bi çariya lavlavê.
-Bi hişkiya Silavê.
Sorgula min.
Sosreta min.
Darbesta min.

Darbesta min.
Ku dûr bim
Bilûreke bêhiş bim,
Bo çavsoran çûr bim
Û ji nişkê ve,
Giwîzan û devê şûr bim!
Da tu li ser zendê vebişirandinê
Xeweke zelal derbas bikî
Kaniya şiyarbûnê me lê!
Da goşiyên tirsê ji rezê dilê te berhev bikim
Xwe bi mêranî Didim nasîn!
Da rexên pirsê li ser lêvên te bipîvim
Gav bi gav xwe dispêrim maça te!
Bajarên evîna te.
Bi ronahiya çav vêdixim.
Bi te dikevim!
Mîna pilopilo
Mîna kêzika hecê.
Mîna serê derziyê
Te di bin çermê dil de vedişêrim.
Keskesorekê ji kovana çiyan.
Bo te hildibijêrim…

Helebçeyê!
Eger tu keça hîman bî
Neviya berf û qeşan bî
Gera can û rewan bî
Mey û helbestek Goran bî
Dê bên bexçeyên mirina te!
Ji felsefeya axê
Ji perwaneya li dor çiraxê
Dê bên,
Ji hûrê deyaxê
Zengil di dest wan de
Kevok di mil wan de
Dîrok di dev wan de
Xerdel di zik wan de
Gula heft ber
Di xêz û saz û hiş wan de.
Tu yê bibêjî:
Hûn çi divên?
Simbilên Medyayê zer bûne
Mertalên Rustem kerr bûne
Pizikên Selahedîn der bûne
Û!
Hesreta Cegerxwîn
Destgirtiya Hêmîn
Feratê seranser xwuşîn
Çav zelal û şîn
Şerbikê bûkê
Şoreşa enîgirêdayê
Welatê gulperîn divên1
Welatê dil xemgîn divên!

Ji paytextên xweliyê,
Ji Ehmed Arif
Ta dilovaniya zencîrên kevn.
Ji pêlên riha Şêx Seîd
Ji cama qirika wî
Ta sînorê mizgînxêra Zûhayiyê…
Ji bejna Zozik
Ji hina simbêlê Seyidxanê Kerr
Ta sîle û pêkenîna bayê…
Ji giwîzên dilrevîn
Ta xwêdana pişta Nemrûd
Ta peqên zimanê min
Hustxwarkirina tîp û stranên min
Ta kilîta buhiştê
Ta destmal û qermîçekên dilê dayê…
Ji bîranîna te,
Ji sersala te,
Ji berfa sor.
Ji sibehên zerikî,
Ji naveroka êşeke tîr-pîr.
Ta biservebûna şopa tayê…
Te dinivîsim Helebçeya min bi ava payê…
Çend sedsalan, te guvaştin
Te kuştin?
Çend caran maçek bo min
Li ser gula xwîna te nehiştin?
Te çend lehî, xwînrijî, vexwarin
Çend singoyên rizyayî
Ji destê felekê, te xwarin?
Helebçeya min!
Lê moxila vê serdemê.

Dizê hêlîna bêguneh kî ye?
Dengbêjê hilata rojhilat kî ye?
Kurm û tirşahiya roj felat kî ye?
Neynika çavşikestî kî ye?
Helbestvan kî ye?
Pêzan?
Jibervan?
Bê te çend zindan li xwe girtin?
Bê çend koremaran bi te vedan?
Bê te çend kilîlên bûkaniyê guhertin?
Bê çend berfan sînga kewan himbêz kirin?
Bê çend hesp û kevanan
Bê çend tajî û nêçîrvanan
Te di qafê berbangê de genî kirin?
Te dinivîsim Helebçeyê
Bi ava payê…
Îro!
Ji qada berûyan
Koça xwe bar kiriye oksejênê!
"Ehmedê Mala Mûsa yadê min dixwaze û min nadinê!"
Goristaneke dirêj e
Li dor xewna te ye
Helebçeya min

“Hey ho li me xerîbê! Bê zicq û nesîbê
Xerîba xwedê mo. Tara li devê rê mo
Hesreta mala bavê mo”
Pêt û ar û tirêj e.
Li dor newqa te ye
Helebçeya min.
Tava te keziyan dihûne
Li ber dengêbalefiran,
Mitsek ji stranên bêriyê
Li Kerbela dilê te diçêrin
Di dojeha maça min de
Tama axê tal dibe.
Rêzên şîniya giranbuha
Nexşeyên eşqa bêreng
Helbestên girî û hawarê
Hinarkên Helebçeyê diqelêşin…
Rêçên ji toza sermest
Gundên bê navnîşan
Aso ji tovê hejîrê dikêşin…
Te li dor govenda mirinê dicivînin…
Bêhişiya xerdelê bi pola çavan dimeyînin…
Te ji afatîya mirina bê tembî direvînin.

# NAMIQ HEWRAMÎ

## Jiyanname

1970yî de le hewramanî lhon le şaroçkey (tewêle) ledayk bûwe. Xwêndinî seretayî û nawendî le helebce xwêndiwe. Salanêk awarey êran bûwe. Beşêk le xuyndinî amadeyî le êran û beşêkî le slêmanî tewaw kirdiwe. Le kotayî heştakanî sedey rabrdwewe karî nusîn û rojnamewanî dekat. Le heştakanda le awareyîda le yekêk le ordugakanî êranda be des nûs rojnameyekî derdekird û dwatr be fotokopî çapî dekird. Yekem berhemî le govarî (awêne) blaw kirdwetewe. Lepaş raperînî 1991 we berdewawe berdewam karî rageyandnî kirdwe le hersê beşî (bînraw û bîstraw xuyndraw) kirdwe. Le zankoy selahedîn le hewlêr beşî rageyandnî xwêndwe. Le zorêk le konfranse nawxoyî û nêwdewletîyekanda beşdarî kirdwe. Endamî fîdrasyonî nêwdewletî rojnamenûsanî cîhane. Be kurdî û erebî û farsî denûsêt

## Berhemdarî

1. Şkanî awênekan, Helbest 1997
2. Stran û awazî kurdî (hewraman) legel cemîle celîl be hawbeşî nusrawe le yerîvan çap krawe 2006
3. Yerîvan xever dide, Bîreweryekanî ordîxanî celîl leser radyoî kurdî yerîvan 2007
4. Duay enfal, raportî rojnamewanî leser enfal 2008
5. Hejar le sne, koy wtarekanî kongrey hejar le sne ke salî sazdra, 2010
6. Têkstî jnan le defterekanî yarsanda, lêkolînewe leser qelemî jn le eayînî yarsanda2011
7. Darstanê le şmşal...........helbest2012
8. Peyrewkaranî yarsan le krmancî serûda, lêkolînewe leser eayînî yarsan 2013
9. Hewramî zmanî eayînî yarsan, Lêkolînewe leser eayînî yarsan 2013
10. Pjgya, helbest be hewramî2013
11. Dîrîne şnasî frhng huraman, 2013 lêkolînewe be farsî
12. Bêtoyîm koten sara, Helbest î hewramî, 2019
13. Dastanî şêxî senan be hewramî, Lêkolînewe u serrastkirdinewe, 2018
14. Memu zîn be hewramî, Lêkolînewe.. 2020

## Dîsan Nusînewey Naûmêdî

*dîsan bo 3/16.. suêy brîntan demsutênê*
*bo ewaney lewênekedan*
*hemû ştêkî min le mirdinî ewan alawe,*
*ewane beşêkin lexêzanekem*

1
îse bedyar
mezarî zamî azarû
cestey sya zûxaltanewe ramawim
dane dane brîntan ejmêrim
hon hon gryanim lêdetkêt..

2
êsta min,
nazanim hem yan na
euey deyzanim eweye:
nîwem legel êweda xinka w
nîwekey term bekomel nêjra
em êsta hîçêk nemawe bo min
cîge nebunêkî ebedî û
hesretêkî pir tenyaîî û
wêneyekî reş û spî duay xotan...

3
Em êsta.
cîge leya dewerî mergî êwe
hîçm nîye bînusmewe.
ax ç mergêkî seyr bû
êwe bo nustn û minîş bêdar mawme tewe?

4
Êsta pît be pîtî naweketan
hunce dekem
lemserî dêrewe bo euser
herçî heye
hemuy yeksane
bemergî êweu,
azarî hemîşeyî bo ê me..

5
êsta le geruy nalîndam
wek helebcey naw gryanekanî daykim
wek brîne xwênawyekanî
cestey bawkim..

# M. EMÎN KAÇAN

## Hewar To Rê Helebçe!

Serre 1988, 16ê adare…

Ca Helebçe, ware Helebçe,
Hêş Helebçe, jan Helebçe,
Kul-keder Helebçe
Bermayiş Helebçe, bermayiş Helebçe

Hewar halê ma Kurdan rê!
Ey Xwedayê erd û ezmana,
Xaliqê pêro însan û cana:
Gelo hêdî bes nîyo?

Tîje amnon mi germin nikena
Teyna wuyayîşê t mi keno germin
Ez wazena ti tim biwuyî
Qickeka mi

**Çavkanî:**

Newepel, Hejmar 73, rûpel. 1

# BERKEN BEREH

## Jiyanname

**Berken Bereh;** Di sala 1954an de li bajarê Şirnexê hatiye dinê. Enstîtuya Perwerdehîyê ya Boluyê kuta kirîye. Cara yekê helbestên wî di kovara Tîrêjê de (yekem kovara kurdî ye li bakur) hatine belavkirin. Heta niha helbest û nivîsarên wî di gelek kovar û rojname û TVyên kurdî de belav bûne (Nûbûn, Nûdem, Jiyana Rewşen, Nûbihar û hwd.). Di sala 1998-1999'an de di pêşbirkên helbestê yên ji alîyê Komeleya Malbatên Girtî û Hukimxwarîyan û ji alîyê kovara wêjeyê Jiyana Rewşenê ve amade kirî de bi xelatên yekemînî û duyemînîyê ve hate xelatkirin. Di sala 1999an de bi navê 'Kulîna Kulîlkan' kovareke înternetî amade kir û çar hejmarên vê kovarê derketin. Ev yekemîn kovara înternetê li Bakur bû. Heman salê, di rojnameya Fıratta Yaşam'ê de dest bi nivîsîna stûnên bi Kurdî kir. Bereh di sala 2013'an de bi maweya salekê di rojnameya Evrenselê de li ser wêjeyê stûn nivîsîn. Hin helbestên wî li tirkî, almanî, fransî, erebî û farisî hatin wergerandin, di antolojîyan de cî girtin. Di çendîn komeleyên civakî de tevlî konferans û panelan bû. Nivîskariya xwe didomîne.

## Berhemdarî

### Pirtûk:

* Êş, Weşanên Sî, 2001
* Şagirtên Evînê, Weşanên Sî, 2003
* Pandomîm, Weşanên Belkî, 2006
* Şîna Helbestê, Weşanên Doz, 2008
* Dilê Min Palgeh e Ji Işqê Re, digel ên berê, Şerbeta Ji Êgir û Haîkû, hemû berhem, Weşanên Lîs, 2011
* Ji Dûriyê Re, Weşanxaneya Lîs, 2013
* Xewna Dawî, Weşanxaneya Lîs, 2016
* Xana Xemê, Weşanxaneya Lîs, 2018
* Çemê Baranê, Avesta, 2019

### Werger:

* Lapis Lazuli, Mehmet Altun, Weşanxaneya Babil, 2011
* A Deryayê Gotî / Denizin Söylediği, Mustafa Köz, Weşanxaneya Lîs, 2012

## Helebçe

em bi hevre mirin mirovno
pênc hezar insan
ne şînahiya asîman
ne xweşikbûna kûlîlkan
û ne jî berbangên awaz çivîk xema me ye êdî
stranên me yên evînî rawestan
lê negerin
naxuyê
di bîbûkên me da jiyan
jixwe em xizmê hev bûn
xewn û xeyalên me wek hev.
em bi hevra mirin
pênc hezar insan

**pîr û kal/**

min tûcar nebîhistibû dengekî wiha
bêhnekî wiha min nekişandîbû cerga xwe
derewan nakim.
dibe we ez ne aniyam bîra xwe
an kûlîlkek neçikanda li ser gora min.
jixwe
gotinên me pere ne dikir
nîvmirî bûn em
tirsiyam dîsa jî
derewan nakim
lê ew zarok çima bi mere ne
qey wê ne jiyan
bê nasnav be jî
an bi xizaniyek xedar

**dergûş/**

çi bêjim bê feyde ye
hatin û çûn a min bi hevra
jixwe
hê nav jî li min ne hatibû kirin

**dayik /**

van bêbavan
pirtûkên pîroz jî nexwendine
ji evînê bê par in
berxê min di derguşê de ma
destên min bûn dareke hişk
û me hev hembêz nekir

**zarok /**

min digot qey
ev jî lîstokek e
hey hawar dikim
kes nayê banga min
goga bavê min îro kirî jî
ma li hewşê
wê kî pê bilîze gelo
kes ma?

**mamoste /**

çiqas li min xweş dihat
evînê hînî zarokan kim
hevaltî,biratiyê
hê zengila betlanê lê nexistibû
ev mirin çima
û li depreşê nîvco ma
nivîsa serfiraziyê

**axa/**

ev çend mal û milk
ev çend dirav û zêr
û bêdadiya min...
nekarî rawestîne mirinê
min digot em ne tê de bin
çima em hay nedan?

**xort/**

min gustîlkek kirîbû
ji bo gulbihara xwe
va em bi hevre çûn
wê ya bidin yekî din
min ji bo wê hewce nema

**helbestvan/**

kê digot
wê evqas bi wate be helbesta me
ku ti car pênusa me
xwîn nerijand

**şivan/**

hê nû zayî bû
berxa miha bedew
yekcar şîr nemêtibû hê
li ber xwe nakevim
bizanin
me bi hevre veşêrin
di bextê we de me
bi seyê har re

**Xuda/**

ez jî şaş mam bawer kin
kê destura vê komkujiyê da
li min biborin
ketime bextê we

**mirovahî/**

hûn bi hevr e mirin
bi wekhevî,bi biratî
rûreşi para me

**dîrok/**

bû deqek tenî
rûnişt li ser eniya min
navê te Helebçe

*ez hêvî dikim mirovno*
*bila kes li deriyê dilê min nexe îşev*
*dixwazim bigirîm*
têra xwe!

# ÎBRAHÎM HEWRAMANÎ

Ledayîk bûy şarî Helebceye. Yekemîn şî'rî le salî 1984 blawkirdotewe , lezorbey govar û rojname kurdîyekanda (başur û rojhelatî kurdistan da) şî'rî blawkirdotewe. Ta îsta 8 komeleşî'rî beçap geyanduwe. Şî'rekanî bo zmanî erebî û farsî wergîrdrawn. Dû komele şî'rî lelayen xwalê xoş bû ehmed selam ewe wergêrdrawnete ser zmanî erebî. Akpr whşe min alyalî amî. Hîkayat msafr. Komeleşî'rî (tnhatrîn mrd dnya) le layen shîl sxn pju – nsîm mrut cu wergêrdawete ser zmanî farsî. We komele şî'rî (kesêk nîye wîneman bgrê) le layen dildar dana we krawete ser şîwe zarî kirmancî jûr. Mawey zyatir le 30 sal karî rojnamenusî kirdiwe. Endamî yekîtî nûseranî kurd e. Endamî sendîkay rojnamenusanî kurdistan e. Endamî fedrasyonî rojnamenûsanî cîhan e. Esta sekreterî leqî helebçe sendîkay rojnamenûsanî kurdistan e.

## helebce

.....
Mindalêkî ecûle ,
Bedyar crîwey estêranewe,
Name aşqekanî
Bo gelay werîw we
Kanî toraw we
Şorebye şerminekan dexwênê tewe.
Lejêr rehmetî barana ,
Helebce ,
Herf beherfî rjawî
Şî’rî terbû dehonêtewe.
Helebce
Mindalêkî ecule
Be çeşnî bayekî bizêw
Le dergay ,
Malî wenewşe û
Syaçemane w
Helwerînî pelkezêrîne deda.

Helebce
Kçe şerminekey nîştmane
Letek (alle akbr) y beyana
Geme legel kanîle dekat w
Çaw şarkê letek estêrana.
Helebce ,
Mindalêke çetun ,
Çetun.
Neberd leşuşe dehawê û
Negelay drextan zuyr deka w
Negemey mindalan deşwênê.
Helebce
Çetûn
Çetûn.
Ta radey xaşq bûn

**Serçawe**

qumê şerab, çapî yekem 2011 l 119-121

## *şarek heye nawîy Helebçe ye*

kiçanî helebce
ta lekanî dênewe.
newek
gozey serşanyan.
rojî sed car
diliyan deşkê!

mindalanî helebce
qamîş dekene trombîl û
beswarî
deron......
deron......
deron......
nagene beheşt û
qamîş debête xolemêş !

kuranî helebce
le şew da le dayîk debin.
le şew da dexwênneweu
fêrdebin ,
goranî bo runakî bçrn !

helebce
asmanêk şk deba ,
lem serî dunya ta euserî.
belam ,
bebê xor
bebê estêre,
bebê mang!

helebce
şarêke dekewête başurî Kurdistan.
wek henarî lay bawe koçek (*)
mezir w
mêxoş w
şîrîne tamî!

helebce
elêy daristanêkî gewre , gewrey sêwe.
sêwî sûr
sêwî sewz
sêwî zerd
ferîke sêw.
min le helebcem
bonî sêwim lê dê
ew sêwey bo jyan na
be kelkî mirdin dê.

*(*) bawekoçek : gundêkî nêzîk beşarî helebce ye û be henaranêy xo be naw bang e*

# KAMRAN SIMO HEDILÎ

## Jiyanname

**Kamran Simo Hedilî;** di Sibata 1955an de li gundê Hedilê yê bi ser navça Hezexê ve hate dinyayê. Ew di pirtûka xwe ya bi navê Lorîna Pênûsê de sedema nav guhartina xwe wisa dibêje:

"...Ji xewna reşikê tirsê, bi şeqama pîrikê di tarîreşa seqema şevekê meha Sibatê ya 1955an de min bi girî çavên xwe vekir. Nav li min kirin, lê wateya wî wan jî nizanîbû. Navê min kirin Faruk. Divê ku ez wijdana xwe xirab nekim. Paşnav ne wan li min kir. Berî ez werim dinyayê reşikê tirsê paşnavên bi zimanê xwe watedar li herêmê belav kiribûn. Destûra bijartina paşnavê ji kesî re tune bû. Pêwîst bû her kes ji van paşnavan yekî li xwe bike. Ji paşnavên reşikê tirsê belav kirin Aslan bûbû para malbata min. Vêca navê min bûbû Faruk û paşnavê min jî bûbû Aslan. Min ne ji navê xwe û ne jî ji paşnavê xwe hez dikir. Navê min mîna şalwarekî li mirovan teng bê, min ji xwe re teng didît. Paşnavê min jî mîna kirasê gurîyan bê çawa laşê wan di xwirêne û qet naxwazin li xwe bikin, paşnavê min jî bi gezan dihate min û ez gez dikirim. Roja min hêza bijartina nav û paşnavekî bi zimanê xwe di xwe de dît, min şalwarê teng derxist û avêt. Kirasê ez gurî dikirim jî min bi şalwarê teng re qet qet kir û ew jî avêt. Li meydanê min şûrê xwe kişand, bi nav û paşnavê xwe yê nû Kamran Simo Hedilî li hemberê reşikê tirsê ketim nav bizavê." Di zaroktiya Kamran Simo Hedilî de malbat, mala xwe bar dikin bajarê Batmanê. Di temenê ciwaniyê de dikeve nav tevgera azadiya Kurdistanê û ji ber wî awayî ji terefî Dewlata Tirk ve du caran tê girtin. Di cûnta eskerî ya 12ê Îlona 1980î de bi hevalên xwe re derbasî rojavayê Kurdistanê û Lubnanê dibe. Xebata xwe li rojavayê Kurdistanê didomîne. Li wir jî gelek caran ji terefî Dewlata Surî ve tê girtin. Ji rojavayê Kurdistanê derbasî başûr û rojhilatê Kurdistanê dibe. Li rojhilatê Kurdistanê ji terefî Dewlata Îranê ve jî tê girtin. Her sê dewletên Kurdistanê di bin destên xwe de digirin, wî digirin û zilma xwe nîşan didin. Kamran Simo Hedilî di amadekarî û xabata 15ê Tebaxa 1984an a çekdarî de cih digire û ji nû ve di tevgerkirina gel de li bakurê Kurdistanê cihê xwe digire. Ew, endamê Yekîtiya Nivîskarên Swedê ye û endamê Pena Kurd a Navnetewî ye. Vêga ve serokê Înstutiya Kurdî li Stockholmê ye. Ji 1982an ve dinivîse. Kurteçîrok, helbest, destan û lêkolînên wî di rojname, kovar û malperan de hatine weşandin.

# Berhemdarî

1. Lorîna Pênûsê [Helbest] Weşanên Kîtabî Arzan Stockholm - 2004
2. Civata Giyanan [Kurteçîrok] Weşanên Navenda Pedagogiya Kurdî, Stockholm - 2006
3. Ji Enfalê Şeveke Bê Sibeh [Helbest] Weşanên Navenda Pedagogiya Kurdî, Stockholm - 2006
4. Min Deng Kuştin [Helbest] Weşanên Navenda Pedagogiya Kurdî, Stockholm - 2006
5. Helbest Çi Ye [Lêkolîn] Weşanên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm-2009
6. Kîjan Kulîlk Çavên Te Ne [Helbest] Weşanên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm - 2009
7. Babilîsok [Roman] Weşanên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm- 2012
8. Pêxemberê Jibîrçûyî MANÎ [Roman], Weşanên Ar, Stenbol - 2013
9. Pêxemberê Jibîrçûyî MANÎ [Roman] Çapa 2mîn, Weşanên Ar, Stenbol - 2014
10. Dilê Xewnên Xwe Me [Helbest], Weşanên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm- 2015
11. Qêrîneke Bêdeng RINDÊXAN [Roman] Weşanên Aram 2015
12. Qêrîneke Bêdeng RINDÊXAN [Roman] Weşanên Çapa 2mîn Înstituya Kurdî Li Stockholmê,
13. Stockholm- 2016
14. Berbanga Êvara Mirî [helbest] Weşaşên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm- 2017
15. Berbanga Êvarê [Helbest] Çapa 2mîn, Weşanên J&J, Amed - 2018
16. Dilopên Lal [Helbest] Çapa 2mîn, Weşanên J&J, Amed - 2018
17. Ji Enfalê Şevên Bê Sibeh [Helbest] Çapa 2mîn, Weşanên J&J, Amed - 2018
18. Kîjan Kulîlk Çavên Te Ne [Helbest] Çapa 2mîn, Weşanên J&J, Amed - 2018
19. Lorîna Pênûsê [Helbest] Çapa 2mîn, Weşanên J&J, Amed - 2018
20. Min Deng Kuştin [Helbest] Çapa 2mîn, Weşanên J&J, Amed - 2018
21. Helbest Çi Ye [Lêkolîn] Çapa 2mîn, Weşanên J&J, Amed - 2018
22. Pêjna Baranê [Roman] Weşanên J&J, Amed – 2018
23. Pêjna Baranê [Roman] Çapa 2mîn, Weşanên Înstituya Kurdî Li Stockholmê, Stockholm- 2019
24. Serpêhatiyên Winda (çîrok) Çapa yekemîn Weşanên Înstituya kurdi Li Stockholm -2019.

## Bihara Beravêtî

di tariya xayîn de
roj xesandin
pelên azadiyê weşandin
li şazdehê adarê
goristanên Mediya giriyandin
ji kelha sitemê
mêlkemotên jehrê şiyandin
di tariya xayîn de
roj xesandin
min jan û kovanên
kolanên bihara beravêtî kişandin
di henasa xwe de
qêrîn û girî girtin
bi lehiyên vereşandina jehrê
di qolincên bajarê bêmecal de
Helebçe kuştin
di tariya xayin de
roj xesandin
axînên Helebçe
li çolbeyarên giyanan
herikîne bêdumahiya dilê min
min gazî kir
werin netirsin
sêwiyên paşmayên Medan
di cîhanê de
hûn bi cih nebûn
cîhan nikare we veşêre
werin
di mêjiyê min de
xwe veşêrin
werin destên min bigirin
em cîhana xwe
biafirînin

bi çavên êşê
bi axîn û girî
bi agir û hilma tirsê
li min nenêrin

hêstirên we
kaniyên çavên min ziwa dikin
binêrin ser xwe rakin
baskên xwe vekirine
stêrên jînê
rabin
li dilê min siwar bin
binêrin
bayê jînê
hate Helebçe
tirsa leşkerê Med
kelha sitemê hejand
bircên Tikrîtî hilweşandin
bi hilma mizgîniyê werin
werin bikevin dilê min
pênc roj mane
bibe cejn li welatê me
em cilên xwe yên
rengerengo li xwe kin
li kuçe û kolanên
leyîstik lê mirin
agirê cejna Newrozê pêxin
kom bi kom
govendê bigerînin
rabin werin
werin bikevin mêjiyê min
di mêjiyê min de
bijîn werin

# ARJEN ARÎ

## Jiyanname

**Arjen Arî;** di sala 1956an de, li herêma Mehsertê, li gundê Çalê hatiye dinyayê. Di sala 1979an de Enstîtuya Perwerdehî ya Amedê beşa zimanê tirkî qedand. Weke gelek helbestvan û nivîskarên kurd wî jî bi tirkî dest bi helbestê kir. Di sala 1976an de li Nisêbînê ji ber belavkirina belavokekê hate girtin. Wê demê polîsan dest danîn ser helbestên wî yên bi tirkî û kurdî. Qasî hefteyeké di hepsê de ma. Ew berdan, lê helbestên wî ta niha di mexzena Dadgeha Nisêbînê de hepsî ne. Di gel ku weke cara pêşîn di kovara Tîrêjê de helbestên wî hatin weşandin, ya rast, helbesta wî ya ewil di belavokeke ku li herêma Mêrdînê hate belavkirin de weşiya. Ew helbest ji sê malikan (beytan) pêk dihat. Malikek jê ev bû:

"Du mirin kirin mahne,
rakirin ling Nisêbînê
Xewa sibê bela kirin,
avêtin nav tirs û xwînê."

Her wisa, beriya 12'ê îlonê helbestên wî ji hêla paleyên tevrika pembû ve bi stranî dihatin gotin. Wek:

"Tewrik tewrik tewriko, tevriko
Ber tayê pembû xweş biko, tevriko
Roja me jî hindiko, tevriko
Maldar bi qurbana mi ko, tevriko
Tevrik tevrik tevriko, tevriko"

Anjî:

"Roja pala erzan e
Kufletê mal girina
Mala te xera bibe maldar
Ma qey tu pê nizane!"

Piştî 12ê îlonê de ew li welêt ma, helbestên wî di kovarên li derveyî welêt wekî Berbang, Kurdistan Press, Nûdem, Çira, Pelîn û Rewşenê de hatin weşandin. Di

sala 1992an de li navçeya Nisêbînê li ber deriyê mala xwe rastî êrişeke çekî bû û birîndar rakirin Nexweşxaneya Zanîngeha Dîcleyê. Ji wê bûyerê de Arjen Arî li Amedê dijî. Di avakirina Komeleya Nivîskarên Kurd û PENa Kurd de cih girt.

Di 30ê Cotmeha 2012an de ji ber nexweşiya pençeşêrê çû ser dilovaniya xwe. Gora wî li goristana Yenîkoyê ya Amedê ye.

Weşanên Sor, ku piştî wefata wî li gel malbata wî hêj li ser navê wî pêşbirka helbestan li dar dixe.

## Berhemdarî

* Ramûsan min veşartin li geliyekî, helbest, Weşanên Avesta, 1999
* Ev çiya rûspî ne, helbest Weşanên Avesta, 2002
* Destana Kawa, helbest, Weşanên Elma, 2003
* Eroûtîka, helbest, Weşanên Lîs, 2006
* Bakûrê Helbestê / Antolojiya Helbesta Bakûr, antolojî, Weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Duhok, 2008 (Evrensel Basım, 2011)
* Şêrgele, helbest, Weşanên Avesta, 2008
* Çil Çarîn, helbest, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, 2009
* Bîhoka li pişt sînor, çîrok, Avesta, 2010
* Payîza Peyvê, helbest, Weşanên Belkî, Amed, 2011
* Destana Kawa û Azhî Dehaq, destan, (Wergere tirkî: Şener Özmen) , Weşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol, 2011
* Kulîlkên Beîvan, helbest, Weşanên Ronahî, Amed, 2012
* Gorî û Bindest, helbest, Weşanên Ronahî, Amed, 2012
* Xasenezer, ceribandin, Weşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol, 2012
* Şiîr û Sînor, helbest, Weşanên Evrensel Basım Yayın, Stembol, 2013
* Xame sihurî kaxiz şiyar ma, ceribandin, Weşanên Ronahî, Amed, 2013
* Heftê û Du Nefî, Weşanên Evrensel Basım Yayın, 2016
* Efendîno, Helbest, (Hemû Helbest) Weşanên Sor, 2019

## Li Ser Helebçe

qut bûn ji biharek din
bi jînê şa nebûn
hinek pûç bûn
di Helebçe de hinek kor…
hinarkên ruwa sor sor
ji heyva nîsanê nêrgiz
bilbizêq
û beybûn
tev… zarok bûn…

tev zarok bûn, tev de jin
bi jahra xerdelê mirî…
dilê min perçe perçe
dilê min parî parî
bi adarê re bihar digirî
li sikakên Helebçe

û ez
helbestkarek im di hêlekê de
birînên min Nagazakî
êşa'm piç-piç Hîroşîma
bi dû ewrên jahrî
tiştek nema di Helebçe de
ji nêrgiza
ji bilbizêqa
ji beybûna…

# LEYLA BERZENCÎ

## Jiyanname

**Leyla Selaheddînî Ehmed Berzncî [Leyla Berzncî]** 1982 Le Qezay Soran çawm be dinya helhênawe. Berwanamey diblom cugrafî geştyarîm le peymangay Teknîkî Hewlêr û bekaloryosî perwerdeym le komelayetî bedesthênawe xêzandarim û xawenî du kiç û kurêkim.. mamostam lequtabxaney aştî stî dû serbe perwerdey deştî hewlêr. lesalî 1998 denûsm û lesalî 2018 ewe berhemekanm le govaru rujnamekanda blawdekemewe

## zamî helebce

................
ho helebce
şarî dîl û lebîrkraw
toş weku hemû bonekan
yadt ekrê w...
bebalay şengta heledrê!
hemû salê zamî kont
ekulêtewe!
herçî dê.. heta etwanê
çîrokî {şanzey azar}t
elêtewe !!
leher layeu beşêwazê
şîn û prset bo daênên!
be pênc xulek.. matemînî
taze ekrê tewe.. belên !!

helebcekem...
şeş salan bûm
we bîrm dê
be'sî faşî
toyan xnka
be bonî sêw toy xste xew
xewêkî nermî bekomel
gewrew bçuk û pîru law!
lehemû lawe kewtne duay
aporay mergêkî bed naw!
bîrme şarê.....
be bonî sêwî sewz xnkaw...
hewr be dlya helzna
îzraîlê bebê westan
bêcyawazî lerohkêşan
aporay şîn!
helebcey.. pepûleasay
xzande baweşî yektr
serxewêkî tal û şîrîn!
be bê raxer
xewnî azar û newroz bû
şîwenêkî be komelîî dilî hoz bû

helebcekem
tawant
tenha tebayî w....
kurdbûn û xoşewîstî bû
ta ku key bacî kurdbûnî xo man bedeyn!
asmanî to..
bo hemîşe...
bê truskew rûnakye
pire le hewrî bê aman
pire le xewnî erxewan
daxem naçê
omerî xawer hewlî da
cegergoşey aram beka
hengawî na berew lûtke
negeyşt û ejnoy şika !
akamî korpekey nedî !
Le jêr sêberî dîwarê
Hel trûşkaw....
hegbey ceger goşey dana
bo wçanêkî yekcarî w..
serxewî qulî ebedî!

Lê rewe..omerî xawer
nuqmî şadî û germe şîn bû
çawerwanî helhatnî xorî jîn bû

eî şare dilzamdarekem
hemûsalê...
yad dekem.. bediltengî!!
qet lebîrim naçî tewe
komel komel
xezabûne amêzî yek
be bêdengî !!
de hewreke....
bbarêne û bîşorewe
şewnmî sûtanî ceste û
bonî sêwe sewzekanî baxî mîr
debbarew..
xemî pr azar wgewrey
helebcekem bşorewe !
debbare w.....bîşorewe !

**Leyla Berzencî | 2016/3/16**

# MIZGÎN RONAK

## Jiyanname

**Mizgîn Ronak;** di sala1973yan de li Amedê hat dinyayê. Bi şoreşa ku li bakûrê Kurdîstanê roj bi roj geş dibû re di nîsana 1991an de tevlî refên şervanên azadiyê bû. Di tîrmeha 1992yan de li navenda Amedê hat girtin. Di encama darizandinê de di sala 1993yan de cezayê muebetê lê hat birîn. Piştî ku li girtîgehên Amed, Êlîh, Sêwaz, Mêrdîn, Elbîstan û Çewlikê ma bi sirgunên girtîgehan ên di sala 2013an re sirgunê girtîgeha Gebzeyê hat kirin.

## Berhemdarî

* Sêv Jî Me Dikujin, Helbest, Weşanên Lîs, 2008
* Em Bûn Baran, Roman, Weşanên Aram, 2011
* Dilavî (Li Ber Devê Birînê) , Helbest, Weşanên Ar, 2014
* Rojhat, Roman, Weşanên Sîtav, 2018
* Nobedarê Gulên Kobanê, Roman, Weşanên Sîtav, 2018
* Gorçiya Ne Em, Çîrok, Weşanên Sîtav, 2018

## Li Helebçeyê Sêv Jî Me Dikujin

Li me barîn gulên ramûsandî
Heyvên çavpêketî
Baranên vexwarî
Û bêhna şîr na,
A barûdê tê
Ji devên berxikên welatê min
Û li Helebçeyê sêv jî me dikujin.

## Sîmayekem Helebçe

Bayê ewrên reş bi dû dilê min xist
Ez bi qurbana xemgîya gulê
Axîna baranê
Li ku man destên min ên xeyalperest?
Xewn bi ku ve çû, ey hespê spî?

Helebçe çi dibêje di mirina bihareke Kurd de?
Çivîkê dilê min revand pênc hezar caran
Nizanim Kurdîtî biçi zimanî qise dike li Helbçeyê?
Em ê çawa li rûyê heyvê mêze bikin?
Em ê zarokên kuştî li ku veşêrin edî?

Heyrana guliya darê, xwe bi ser mirina min ve şikandiye
Em spasdar in cîhan
Te em bi bêhna sêvan jî kuştin!

Barên min ewrên Helebçeyê
Bajarê me dirîşikestî
Me mifteya jiyanê ji dest daye
Heyrana morîya xwena biharê
Te xwe bi ser janiyan û kaniyan de
winda kiriye li jangehê
Hingiv jehrîye, hewarê!
Li Helebçeyê sêv jehrîn, nêrgiz û baran jehrîn
Em spasdar in, "mirovheziya" Ewrûpayê,
Îmandariya Rojhilat!
Em spasdar in sêv jî bûn jehrîn, hingiv jî
Kurdîtî di nava jehrê de ma li dergûşa Helebçeyê

Heyrana baskên pepûleyan
Xwe bi ser mirineke biharîn de şikandine
Dê çivîk li ku hêlînê çêkin?

Çavan hêsirên xwe, destan tîna xwe li ku hişt?
Helebçe, qey cîhan dilopek jehr e ji me re?

Qurbana çivîkên kuştî
Xwe li ber Kurdîtiya Helebçeyê danîne
Ax, pelên daran, ax, toza jiyanê, jana birînê
Ax, axîna dilan
Xwe li ku dihewînin niha?

Bilbil ji ku avê vedixwin,
Li ku bêhna xwe vedidin kulîlk?

Barê min çivîkên kuştî
Çavên min ewrên bêbaran
Cîhan jî, teoriyên rûpeyker jî, şaristanî jî
Nakin bi qasî şopa morîstangekî
Rêberê min morîstangek e niha
Ez diçim Helebçeyê

Heyrana mijangên şewitî,
Xwe bi ser mirinê de girtine
Hinneya destên mirî
Xwe di axînekê de veşartîye

Helebçe yarekem! Xwîşkekem, birayekem! Hîwayekem!
Helebçe mirinekem! Perîyekem! Dilekem!
Dizanim tu niha jî dişewitî.
Tunebûna Sedam û peykerên wî, birînên te venamirîne

Helebçe! Sîmayekem!
Xemla bûkanî,
Şal û şapik, kiras û xeftan,
Gustîlên destgirtiyan,
Gotinên li ser zar û zimanan,
Helbestên dilwar çi dikin di binê axê de?

Ji mêjûyê têm.
Barê min kilê subhanî,
Kenê deşta Silêmanî,
Evîna Mahabadî
Barê min Dîcle û Ferat e bo to, Helebçe!
Baxên yarên te bextewar bin bila
Dahatûyên te bextewar
Heyrana bisk û keziyên çilmisî
Xwe bi ser xemgîniya hêlînên vala de berdane
Şîrê dayikên bajarê min axê dimijîne

Zarok nikarin şîr bimijin êdî li vî bajarî
Heyrana çavên mexmûr,
Xwe di kîjan şevê de veşartine
Û strana kenên berçem
Xwe li ku dişikêne niha?

Helebçe, sûretê me yê li dîwêr dardayî.
Em hemû di kûrahiya şeva wê de razayî.
Girîyê me ye.
Em yeko yeko di jana wê ya nederbas de hişyar in.
Birîn e Helebçe, li me kînekîn e!
Nayê girtin bi tu dozvekirin û darizandinê.
Helebçe barê me
Barekî ji ewran siviktir
Lê ji zarokên kuştî
Ji Newrozên fetisandî,
Ji keserên Kurdîtiyê girantir û girantir!
Heya dinya ava, Helebçe sawa
Ev bajarê kuştî me vedişêre di nava ke-
serên xwe yên kujer de

Pênc hezar caran dibin pepûlekey aza-
diyê em li wî bajarê pepûle
Kes nikare xwe ji vî bajarî veşêre
Tu dem nikare ji rûyê me û rûyê cîhanê bibe

Wêneyê vê “pepûlekey agir”

Ka destê xwe bidin ser dilê xwe
A ku diperpite Helebçe ye di sîngê me de
Ka li kûrahiya şeva çavên xwe mêze bikin
Hûn ê sîmayê pênc hezar pepûleyan bibînin
Li şevan çavên xwe, li Newrozê mêze bikin
Da ku ev bajar destê we bernede

Helebçe!
Destê me bernede!

## Helebçe

Min tu di kulîlkên
Helebçeyê yên şewitî de dîtî
Di awirên zarokên kuştî de,
Min tu di ewrên napalmê de,
Di kenê kuştiya dawî de dîtî
Min ji te hez kir
Di lêvên Helebçeyê yênbi pirrkujiyan sorbûyî de,
Di kolanên wê yên dengegaz de,
Di mijangên wê yên şewitandî de,
Ji te hez kir min

Ez li Helebçeyê
Hatim çavên te
Di çavên te de ji te hez kir min

## Helebçe

Helebçe! Helebçe!
Silavên gulbarîn,
Helbestên dilbirîn,
Rondikên bi perwîn li te!
Tu "bajarê hozan û helbestkaran"
Warê pispor û zanayan!
Mirineke bêwext û pêşwext,
Mirineke pênc hezar carî,
Mirineke birîndarî ji bo me!

Lê mizgîn li te Helebçeyê!
Tu yê dîsa bibî "bajarê hozan û hunermendan"
Bajarê mihrîcan û govendan
Bi Bakûr û Rojhilat geş bibî
Bi bihara Kurdistanî rûken û dilşa bibî

Helebçe! Helebçe!
Mizgîn li te!
Di Adara 2003yan bibe destpêka vejîna te.
Dê mêrg û zozanên te,
Ji nû ve bibin bihar,
Xwe bigihînin Dîrok Birîndarên Te!
Newroz bihar e, Helebçe!
Newroz li te pîroz!
Newroz li Pênc Hezar Şehîdên Te
Pîroz Be, Helebçe!

## Jantirîn Helebçe

Xweştirîn Kurdîstan rûyê te ye
Jantirîn Kurdîstan Helebçe!..

## Bajarên Sêvîn

*“Ew xwîn e, ne şefeq e rijiya ye” Şêrko Bêkes*

Bajarek ji sêvan bû Helebçe
Zarokan sêvan didan ber diranan
Daran tenê kulîlkên sêvan vedikir
Dayîkan rîçala sêvan çêdikir
Dikandaran tenê sêv difirot
Bajarê sêvan bû Helebçe
Jinan xwe bi kulîlkê sêvan dixemiland
Terziyan cilên bisêv didirûtin
Her tişt sêv bûn…
Kulîlkên sêvan deynin ser birînan
Ma mirin dikare bi bêhna sêvan were?
De rabin!
Kulîlkên sêvan
Tevlî oxirkirinan bikin…

*“Çawa bêxem li jiyanê dinêrî*
*Sûretên te hay jê nîn in ku tu mirî” M.Mungan*

# HEME EHMED CAF

## Jiyanname

Heme ehmed caf / şaîru rojnamenûs
Le salî (1957) le şarî qeladzê ser be parêzgay slêmanî le daykbuwe
Le salî 1980peymangay îdarey slêmanî tewau kirduweuhelgrî brwanamey (dblum) e
Le salî 1980 û duay tewau kirdinî xwêndn bezor brawete xzmetî serbazîî û le şerî negrîsî (êraq _ êran) da helatuwe û bote pêşmerge ta salî 1986.
Le salî (1974) we şî'r denûsêt û le salî (1977) yekem berhemî şî'rî le govarî (beyan) da çap û blawkrawetewe
Lerojnamew govarekanî şaxîşda babet û berhemî şî'rî benawî nhênî blawkirdotewe.
Xawenî çwar berhemî çapkrawe lewane dwanyan dîwane şî're benawî:
1. lawkî pêşmerge \şî'r \ 2004- hewlêr
2. îşq û temen \ şî'r \2010 – hewlêr
3. ko berhemêkî şî'rîî û çend berhemêkî trî edebî amadey çapn
Endamî lqî slêmanî nûseranî kurdu endamî karay sendîkay rojnamenûsanî Kurdistan û endamî fîdrasyonî rojnamenûsanî nêwdewletîye
Le salî 1996ewe ta 2003 skrtêrî nûsînî ajansî dengubasî Kurdistan û endamî destey nûseranî radyoî herêmî Kurdistan û berêweberî nûsînî govarî xorî îslam û sernûserî rojnamey (bazuuy krêkar) û berêweberî rageyandn û peywendyekanî wezaretî euqaf buwe.
Le salanî temenî nûsînda be deyan xelatî rêzlênanî wergrtwe.
Xêzandarew xawenî (sê kç û dû kure)
Êstaş zyatr le (25) sal debêt le rojnamey (xebat) le beşî nûsîn û zmanewanî û rênûs kardekat wle şarî hewlêrî paytext nîştecêye.
**Email:** Jafanjaf2009@gmail.com **Telefon:** 0750 446 96 28

## omerî xawer degerê tewe helebce!

................................
Şî’rî :
Eyamê bû...
Lem deverî gul û xoru honraweda
Lew heware qij zerdeda
Hemû şewê...
Roşnayî çend glêneyek!!
Xrmey wrde çewî jêr pêy
Şewrokanî mefrezeyek!!
Wek şîbay şney (mordane)
Kezî zerdî (baxî mîr) w...
Enebî exste lerze!
Gelê carîş...
Le baxelî sermaw soley qerax şara
Destemlanêy desrêjî motekey şewu...
Nuqmî hewal û bas ebûn.

Em behare,...
Le şanzey azarî xemî heştawheşta
Le glêney eşkî sûrî,..
Pr karesat û azara
Le klawrojney wetaxî (wesman paşa) we
Pênc hezargule estêrey, çaw nêrgzî
Ruweu amêzî asoy şar raxzîwun!
Elên: emşew...
Pênc hezar çl erxewanîş...
Le memleketî xamoşî seywanewe
Bo sersengî blurînî (kanî aşqan) dabarîwun!
Her emşewîş...
Pênc hezar xencerî tîjî deskberû...
Le (şnrwê û balambo) we..
Le (dûawan) perîwuneweu...
Bo hanay şar..
Le dîwanî (mehmud paşa) dabezîwun!
Pênc hezar zengyaney sûrîş..
Bo mlwankey,..
Gerdnî berzî (hebîbe) u..
Tesbîhî tehlîley destî (mela xdr)
Berew hewarî (xak û xol) helznîwun!
Her emşewîş..
(ehmed muxtar) le tekyeî şêx îsmaîla
Çîrokî (meseley wîjdan)..
Bo suxtew feqêkanî şar
Begryan exwênêtewe!
(ebdulla begî goran) yş
Emşew le geştî (qerax û hewraman)
Egerêtewe!
Derwêş ebdullaş...
Legeruuy teskî şmşalewe
Frmêskî çawî (senetkar)
Edate dem şepole eşkî (sîrwan) u..
Lawkî heşrêk elêtewe!

- eu demey ke:
(kevr) serî le dund esuuy w...
(çya) ş zmanî,..
le prûşey befr egezî!
- eu demey ke:
(sîrwan) şabalî şepolî pêkdaedaw...
(gulan) mêxekî ser sngî,..
(baxî mîr) î begerdnya helewasî!
- eu demey ke:
helo... heleznaye lutkew...
mêzî dexstewe estoy (tewar) ekey
(kanî şêx) ebû betasey ,..
rêbwarî rêgayekî dûr
bo maçî nêw demî wşkî metarekey
- eu demey ke:
(helebce) kem lankî hîwau..
niştîmanî (pêşmerge) bû!
kwa (rohî befrînî xawer!)
le çawerwanî pêşwazî
eu merge bû!
- eu demey ke:
(enber xatûn)
dugmey yexey êwaranî,..
(kanî aşqan) etrazênê!
(xawer) êk....
le nîgay sûrî (zminako) we
xoy ekatewe beşara !!
ke reşebay merg û xezan
pênc pencey ekate şanew...
qjî zerdî minalanî (ebabeylê) u.. (ha-
cîle) kanî şarezûr daehênê
şemî şewanî tenyaîî
le helorkey henasey germî (welî) da
(helebce) yekî sûtawî
xolemêşî raêjênê !!

Em şew....omer...
le tarîkstan sl naka
le (şnrwê) we fêrbuwe...
çawekanî wek blajktor
bo peykî (deştî şarezûr) dagîrsênê!
le seywanî zamekanyewe fêrbuwe..
çon areqî mandûyetî,..
loçî tewêlî rê bisrê!
le (sûrên) ewe fêrbuwe..
ûmêd bekatî senger û..
le lutke da...
sirûdî gul we xor biçrê!!
omer... emşew...
xurcînê le zerdexene w....
hegbeyek rqî pîrozî helgrtuweu...
degerêtewe helebce!
hêwr. hêwr..
ruweû berztrîn lûtkey...
(şnrwê û eneb) helekşê w...
Le wê kam dund..
le wê kam rê...
zeyatir kewşekanî (welî) w...
hezretî nalî û salm w...
kurdî wgoran wqanî drandbê ,..
alayekî Kurdistanî lê helekaw...
le sêberya lêy raekşê!!
Em şew (omer) bebaweşê nêrgzewe
Degerê tewe... helebcew....
be espayî....
eawngî sergonay sûru be bonkewutuuy,..
le çemî (tancero) î eşka eşwa tewe!!
caleserxo....
balî sîmrxî xeyalêk...
berew cêjwanî sftusoy ,...
kuncî hewarêkî xamoş eîbatewe!
omer... euşo...

le amêzî em serdeme bêzar buweu....
mî nîgay xstote ser...
rêgay geranewey helo!...
boye emşew.. boduayîn car...
dwa melotkey xoşewîstî ,..
bo (helebce) cê ehêlê w....
le gel rewî hewrî naxa
letek şa estêrey geşî kazîweda
be rêçkey rewezu lutkew yal û şaxa
rê daegrê w........
(hegbey azaruazadî)
neteweyek ekate şan
herdêt û dê w...
(newroz) ekate nawnîşan!
şanzey azar ekate
kwanuuy coşsenduuy
renc û xebat wetêkoşan!
baxçey paşa ekate nîştîmanî sêw
(helebce) ş rqî rasawî
xencerî helkêşrawî kêw!!
eucar erwau...eçête pal...
karwanî sûrî rewewe!
dwacar erwau bê malawa......
hewarî sercem omerî xawerekan
cêdehêlê w.....
hêdî.... hêdî...
heleznête...memleketî mêjuwewe!

- ho omerî xawerekan !!
- eî pênc hezar pepûle bal sûtaweke !!

kaşka êsta....
lem hewarî îşq wsozu honraweda....
legel eşkî qetîsmawî ,...
nêrgzî nêrgsecarî şarezûru.....
agrî newrozî nwêda!!
le tek kef wkulî (zelm) u....
kzey şîbay (şnrwê) da!!
legel zengî arayştî eu kçaney ,....
wek pepûle rjawnete (helebce) we
ehatnewe w....
dastanî eu çendîn saley ,.....
xurbettan tomar ekirdu...
hegbey xemî azaru rqî pîroztan
bo (Kurdistan û pêşmerge) ekirdewe !
dîsanewe carêkî tr.....
twêşeberey (gul û nan û azadî) tan
bo (helebce) ebrdewe!

**16 azarî 1991 / Slêmanî**

# NURCAN DELÎL

## Jiyanname

Nurcan Delil, di 10ê meha Kewçêrê de li navçeya Xana Axparê ye, li gundê Bexteriyê hatiye dinyayê. Dibistana seretayî, navîn û lîseyê li Xana Axparê xwend. Ji zaroktiya xwe de bi helbestê re mijûl e. Di saziyên sivîl yên wekî Komeleya Mafên Mirovan, Navenda Jinê de xebitî. Dosyeya ber destê we ya wê ya yekemîn e.

## Berhemdarî

* Risteyên Gazincbar (Helbest) , Weşanên J&J, 2019 - Amed

## Bêhna helebçeyî

sal 1988 16ê Adarê
rojek reş bû
bi behna sêvan
mirinê reşandin li ser Helebçê
hawara Kurdan bû

roj bûbû reş û tarî
dinya bê deng bû
kerr û lal bû
Kurdistan bi hezar cîyan birindar bû
bûbû gola xwînê

hewara dayik û zarokan bû
dinya sekinî bû
bûbû birînek kûr û goristaneke mezin Helepçe

bi hewar in zarok di hembêza dayikan da
û li ser milê bavan

sal 1988 mirovayetî bê deng bû
hêvî di çavên zarokên helepçeyî de sêwî mabû

dinya kerr û lal e
êş û jan tazî man li ser rûyê zarokan

sal 1988
meha Adarê
Kurd bi tenê bûn dîsa
û şûn de
bû bazara hêviyê êşa di çavên helebçê de
dem borî
bazara di çavên neyaran de sar nebû

lê hevî bi bîra azadîxwaiyê re bû
yek her serê sala Kurdan
di meha newrozê de
piştî helebçeyan gulên sor bişkuvîn
û îro em
gulên sor bêhn dikin bi rengê Helebeçeyê

# MERVAN SERHILDAN

## Jiyanname

**Mervan Serhildan;** di sala 1958an de, li bajarê Mêrdînê, li navçeya Şemrexê ji dayik bûye. Diya wî Bedrêya Sêlimê Emer e (ji gundê Şewaşî) , bavê wî jî Felîtê Mehmedhusênê Simoyê Fato ye. Navê wî yê fermî, Besalet Yaray e.

Dibîstana seretayî li Şemrexê, lîse jî li bajarê Edeneyê xwendiye. Di serdema lîseyê de bi mijarên civakî, siyasî û neteweyî re 'hevrû' bûye. Di nava salên 1970yî de ji aliyekî ve berxwedana başûrê Kurdistanê bi hestiyarî şopandiye, ji aliyê din ve jî li ser mijarên siyasî û neteweyî ku hertim rû bi rû maye, hiziriye. Bûyer û geşedanên ku di jiyanê de bûye şahid, ew bi ber xeta azadî û demokrasiya gelê kurd ve beralî kiriye...

Di sala 1980yî de, li Enqereyê Zanîngeha Gaziyê beşa 'Ragihandin û Rojnamegerî'yê qedandiye.

Di navbera salên 1976 û 1980yî de li komeleyan û li taxan beşdarî xebatên civakî, siyasî û bîrdozî bûye; her wiha derheqê mijarên bîrdozî, civakî, siyasî û rêxistinî de li komeleyên Kurd ên li Enqereyê semînerên perwerdeyê dane. Encax piştî darbeyê, ew jî hatiye dîlgirtin; ji aliyê pergala 12ê Îlonê ve bi xedarî hatiye îşkencekirin û bi cezayê darvekirinê hatiye darizandin.

Bi biryara Dadgeha Bilind (Daniştay) çûye ser karmendiyê (Midûriya Karên Rêveberiya Dadgehê).

Di serdema karmendiya xwe de, pirtûka bi navê "Berxwedana Elektropola" nivîsiye. Di sala 2008an de malpera webê ya takekesî bi navê "*www.mervanserhildan.com*" vekiriye. Bi Tirkî û piranî jî bi Kurdî, li ser rojevê û mijarên girîng nêzî 600 makale, dosya, helbest û perspektîf nivîsiye. Ji van makaleyan, li derdora 300 nivîsên wî di rojnameya Azadiya Welat de weşiyane. Di 2009an de sertîfîkaya mamostetiya Zimanê Kurdî wergirtiye. Di navbera 2010 û 2018an de li Rojnameya Azadiya Welat 3 salan karê sererastkirinê (redaksiyon) kiriye, 3 salan di rûpela Forumê de nivîskarî û 3 salan jî di rûpela Aktuelê de qonciknivîsî kiriye.

Niha karên nivîskarî, çavdêrî û çalakgeriya zimanê Kurdî didomîne.

## Berhemdarî

* Berxwedana Elektropola (Roman) Weşanên Berbang, 2015 - Stenbol
* Gerîneka Hestan (Helbest) Weşanên J&J, 2019 - Amed
* Paradîgmanin Înfazi (Analîz- Tirkî) Weşanên J&J, 2019 – Amed

## Helebçe Rabe

Çavên min birîneka misîn e
Dil dixele
Îro çerxa cîhanê xwar e
Hovejehr bi ser min de dibare
Hogirno
Gaziyê bigihînin kevnedîrokan
Bêhna Sedeman hawirdorên min pêçaye
Asîman di bin siya kujeran de maye
Ax Helebçe
Halanên balafirên jehrî hildidin
Êrîş xedar e
Çav dirijin
Pişika min deqdeqî
Ziman nagere
Nikarim hewarê ragihînim
Stûxwar im
Bêkeys im
Hêstrên xwînî dibarînim
Ax Helebçe
Qirik û gewrî ar û şewat in
Bîr û bal li hev digerin
Keserkul im
Bêtaqet dikevim
Mervanekî lal û kal im
Helebçe
Helebçe rabe
Ez şehîd im
Tu rabe
Şehîd ez im!..

# NAYÊB MÊNBERÎ

## Jiyanname

**Nayêb Mênberî,** kurî ezîz, le salî 1964 le gundî nyer ser be nawçey hewramanî jawero, le Kurdistanî rojhelat, hatumete dnya. karî hunerîm le salî 1983 be wtnî goranyewe des pê kirdwe û paşan bûmete hogrî şê'r. hewlm dawe têkstî goranyekanm le nusînî xom bê û her bew hoyewe, em şê'rem weku têkstîk bo srudî helebcedanawe.

## Xeware

şarî bden le sêdare em mîllete namrê
gundî bden le qenare em mîllete namrê

bê akame sûtandn û tarandnu gel kujî
jyan elê lem heware em mîlletenamrê

ger tê bgen mindalî kurd katî le dayîkbûnî
elê bew qîrew haware em mîllete namrê

genc û lawî em wlate gyan le ser destan emrn
tapêt blên eî xeware em mîllete namrê

sedan sale karî êwe her kuştin û brîn e
mîlletê sedan behare bo jîn emrê namrê

# ROZA METÎNA

## Jiyanname

**Roza Metîna;** li Gundê Fitnê yê Dêrika Çiyayê Mazî ya Mêrdînê ji dayik bû. Dibistana seretayî, navîn û ya amadekariyê li Dêrikê qedand. Li Zanîngeha Dîcleyê Beşa Gihaştina Zarokan qedand. Li Zarok Tv'yê Bernameya Fêrgeh, li Stêrk Tv'yê Bernameya Nûjen pêşkêş kir. Niha li JIN Tv'yê Bernameya Teşiya Wêjeya pêşkeş dike. Di 2016'an de bi çîroka xwe ya bi navê 'Keziyên Ji Bêhna Şitlên Rihanê' Xelata Festîvala Sêyemîn a Kurteçîrokên li Rojavayê Kurdistanê girt. Di 2017'an de di 25'emîn Pêşbirka Çîrok û Helbestan a Huseyîn Çelebî de di beşa çîrokên Kurdî de bi çîroka xwe ya 'Têkoşîna Tîpên Qedexe' xelata yekemîn girt. Di 2018'an de di 4'emîn Pêşbirka Çîrok û Helbestan a Deniz Firat de di beşa çîrokên Kurdî de bi çîroka xwe ya 'Mizgînxêrên Derbiharan' xelata yekemîn girt. Di 2019'an de di 8'emîn Pêşbirka Çîrokan a Şerzan Kurt de di beşa çîrokên Kurdî de bi çîroka xwe ya 'Guliyên Ji Bêhna Şemamokan' xelata yekemîn girt. Niha li Amedê li Ajansa Jinê ya Nûçeyan ya JINNEWS'ê dixebite.

## Berhemdarî

Bilindahiyên Xwedanwend (Helbest, Weşanxaneya Tevn, 2014)
Hêviyên Dilazad (Helbest, Weşanxaneya J&J'yê, 2015)
Sêgoşe û Çargoşe (Çîroka Zarokan, Weşanxaneya Hîvayê, 2017)
Tiliya Qereqûçkê (Helbest, Weşanxaneya J&J'yê, 2019)

# Tama Her Tiştî Bi Min Tal Tê Êdî

Di bin bagera tariyeke bêyom de
Li dû giriyê zarokên di nav pêçekê de direvim
Çiloyê li ser benên hilweşiyayî
Yê ku di bêrîka min a çepê de asê maye
Li bêhna xapînok a sêvê hildikume
Qêrîna dayikên li çongên xwe dixin
Pênc hezar carî di guhên min de olan dide
Xûz dibin piştên melayiketan
Ji ber nalînên li ezmanê bi xof bê xwedî tên hiştin
Û tama her tiştî bi min tal tê êdî
Hilm li min diçike
Tiliyên min li kevir û kuçikan dikevin
Tu dibêjî qey bêhna hemû zindewaran jehrê belav dike
Loma ji qidûm dikevim
Piştre li ser tutikan rûdinêm
Û xwîna paqij ji damara min a bi navê Vena Pulmonalîs
Derbasî dilê min nabe êdî

# KOSAR SUBHAN REHMAN

## Jiyanname

ledaykbuy: 1983, pîşe: mamosta, şuynî nîştecêbun:e helebcey şehîd, xawenî 20 çîrokm (lebware cyacyakan), lefîstfalî hewraman be dû çîrok beşdarbûm (xemekanî mindalîkî helebce , deryaî merg), xawenî hendîk berhemî ş'rî hewramîm blawnekrawnetewe

## Helebce Û Razî Îşqêk

helebce bûkêkî ciwan bû
le nêw baweşî srûşt da
hunermendêk nexşand bûuy
tenha tenha xoy deytwanî
belam celadekanî zewî
celade mrov xorekan
qews bûn be ciwanî
qews bûn be helebce
ke nasnamey kurd bûnyan
le nêw toşeberekanî jyan helgirtibû
celadekan î reyyan be hemû ciwanyêk debrd
be asman be zewî be kanî û estêre
be mrove mrov dostekanî helebce
dar henarekan çrioyan kirdibû
denûkyan sûr bû bû
asman rûn rûn
estêrekan crîweyan dehat
‹şq taze be taze dabarîbû
prçekanî yar şney şemal
be demuçawîda dedan
yar leser kolan derkewt
minîş wek snewber ruwam
tenha û tenha temaşam kird
axr ‘şq wehaye
snûrekan debrêt
hewrekan şeq dekat
raz legel estêrekan deka
çunke hêzî ‘şq le hêzî ceng behêztre
axr minî aşq demuyst demuyst
tara leser cwantrîn kçî jyan ladem
demuyst befr behenasey germî ‘şqm btwênmewe
demuyst dest le nêw destî yar
pyaseyek be nêw şeqamekanî şarda bikem
demuyst le gel beharî helebce da

cwantrîn kiçî dunya bo xom berm
demuyst demuyst demuyst !!!
jiyan bo minî aşq
zor razawe xoy denwand
xerîk bû gumanm le pêkewe bûnman dekird
em hemû cwanye
asmanî rûn
estêrey geş
heway pak
‹şqî rast
tîşkî xor
xoy alandbuwe ser rûmetî yar
awênekanî jyan hênde cwan bûn
wextbû ser le heqîqetî cwanî dernekem
belam celadekanî zewî
beruwalet mrov
hatn bew sêwey ke bû buwe hoy le-
daykbûnî mrov leser zewî
her bew sêwe
şarîyan mest kird
mirovyan qir kird
asmanî şaryan be agrû dûkel razandewe
le dûrewe temaşan dekird
jiyan mird
çolekekan hêlanekanyan cê hêşt
le asman berdebûnewe û demrdn
kanyekan qr kran
le roştn westan
drextekan mirdin
hawar û qîjey jn û mindal
çîn çîn berew asman berz debwewe
mirovekan wek yarî beser yekda dekewtin
henasekan le henasedan
destî mindal le destî dayk cyabûyewe
katjmêrekan le kar kewtin
bawk be baweşêk azarewe gor bo

mindalekey heldekenêt
taku cestey sûtawî bşarêtewe
mindalêkî tr
babe gyan min hêşta mawm
newek wa têbgeyt mrdûm
dayk şîr be mindaleke deda
mindaleke şîreke nagrê
dayk tund tund le sngî xoy alanduwe
bxo role bxo
mindaleke rohî frîwwe bo asman
pêdekenêt
dayk nayewê danî pîda bnê ke mrduwe
her delê role bxo
celadekan be bêdengî êmeyan kuşt
ême bedestî kesanêk xnkênrayn
wek ême nawyan mrov bû
eme ç bîrewerîyeke
eme ç zamêkî sarêj nekrawe
gerekekanî şar wek payzyan lêhatuwe
le cêy gela mrovekan helwerîbûn
mindalêk be pştda kewtbû
rûweu asman
axr eu taze be taze fêrî nawî xoy û bawkî bû bû
şaîrêk palî be dîwarê kewe nabû
detgut xew brduyetyewe
axr eu ta êstaş qesîdeyekî bo ‘şqekey nenusîbû
mamostayek be pestyewe xewtbû
axr hêştr xwêndinî sal tewau nebû bû
ta wekû serkewtnî qutabyekanî bbînêt
daykêk nzakanî le qurgîda qetîs krabûn
bawkêk deyewêt pê girtinî mindalekey bebînêt
mindaleke pêş pê girtin radekat
axr eawîney jyanî çendan mrovyan
urduxaş kird
belam êmey helebcey hestaynewe
çuuynewe ser xanuwe rûxawekan

geraynewe ser şeqame şkawekan
be dest û penceman dûbare jyanman
be helebcey mrdû bexşîyewe
em êstakeş
legel her dîmenêkî rabirdû
şanoy jyan û mergman nîşan dedat
hîç layekman natwanîn dest berdarî
euy trman bîn destêkman jyan
destêkman merg
belam ême be komelêk azarewe
hestaynewe
çoleke pasrîyekanman aşt kirdewwe
kanî û karêzu çemîş xurey eawî le amêz grtewe
dar sêwwekanman ruwandewe
dûbare bew hemû azarewe
‹şq êsteş ‘şq
le nêw dlî pr mergesat
le nêw dlî pr azar
şqm parast
dûbare taram leser cwantrîn kçî jyan lada
êste em îşqe xawenî dû newey cwane
sêw û henar
belam ewan mergesatyan nebînîwe
belam merg her brîtî nîye le mrdn
katêk delên babe kwa malî xalm
bo nîmane
daye kwa malî bapîrm
hez dekem bçme layan
eu kat çawekanm frmêsk debarênêt
prsyarekan bebê welam demênnewe
tenha tenha be penhanî le dilî xom da delêm
min le drndetrîn mi,rov ‘şqm parast
min benaw cengelstanî jyanda ramkird
hetawe ku sêw û henar birowênm
ta we ku şarî bênazm helebce
be tenha cê nehêlim!

# MEM BAWER

## Jiyanname

**Mem Bawer**; di sala 1973'yan li Amedê, li navçeya Bismilê, li gundê Safya ji dayik bûye. Di 1997'an de Zanîngeha Dîjleyê, Fakulteya Perwerdehîyê qedandîye. Helbestên wî heta niha di kovarên bi navê Jîyana Rewşen, Pelîn, Kevan, Kulîlka Ciwan, Tîgrîs, Pîtoresk, Kovara Wenda û di Kovara Hewara Botan de weşîyane. Nivîsên wî yên rexneyî di kovara W, Kovara BÎR û di rojnameya Azadîya Welat de weşîyane. Di sala 2004an de di avakirina kovara W'yê de cih girtîye. Heta niha tevli gelek festîwal û panelan bûye. Dîwana wî ya bi navê Stêrka Sêvê û du pirtûkên wî yên zarokan li Farisî hatin wergerandin. Di sala 2014'an de ji bo zarokan tevli sê hevalên xwe Weşanxaneya Hîva'yê ava kir. Piştî kar û xebatên sê salan ew û hevalê wî yê bi navê Ridwan Polat dîsa ji bo zarokan di sala 2016'an de Weşanxaneya MORÎ ava kirin.

## Berhemdarî

### Dîwanên wî

1."Monologên Evînên Kedîkirî "Weşanên Bajar,2004, Avrêl, Helbest
2."Melayîketa Dîl "Weşanên P, 2008, Îlon, Pexşan Helbest
3. "Stêrka Sêvê"Weşanên Ronahî, 2013, Gulan, Helbest

### Wergerên wî

1." Nîl " Enis Batur, Weşanên P, 2009, Adar
2. " Qendîl " Enis Batur, Weşanên P, 2009, Adar
3. "Bayê Safîr " Azad Zîya Eren, Weşanên Pars, 2009, Gulan

### Gotinên muzîkê

1-Meşîn- di albuma"Evînên Şikestî " ya Jan Axîn de.
2-Xeyal- di albuma"Zerîba " ya Jan Axîn de.
3-Zerîba- di albuma"Zerîba " ya Jan Axîn de.

## Pirtûkên Zarokan

MÎRO û Hevalên wî- Weşanên Hîva-2014- (Ji bo pêşdibistanê 5 pirtûk.)
Masîkê- Weşanên Hîva-2015
Hirç û Rovî- Weşanên Hîva-2015
Batirsok- Weşanên Hîva-2015
Destpêka Xwendinê- MORÎ- 2016- (6 Fasîkul)

## Peqikên Avê

her jîyanek peqikeke emirkin e
li ser aveke nermokî diherike
û her wech dişibe kilamekê li welatê min
di şopên pêçîyên xwe de vedişêrin
nepenîya kesayetîyên xwe
şêr in, şer in, şerbaz in

gîyadawidî ne
di rengê rêya Şêx Saîdê kal de dibişkivin
di rûyê aşîtan de
mirin lîstik e li deştên rût
wekî teşîyeke reş digindirînin

stranên serxwebûnê
ji çizînîya hestîyên wan tê afirandin
di topikên notayan de çengekî xwîn diçelqe
û vedireşin enstrûmanên welatê min
li ser lêvên qurmizî stranên reş
deng diherike bêdengîyeke erjeng
dengbêjên dengkal
lal distrên di civatan de

di dîroka vê cîhana qesas de
mixabin…
*Hîroşîma* dibe hezkirîya *Helebçeyê*.

**Ji Dîwana "Monologên Evînên Kedîkirî"**

***Mem Bawer***

# HESEN NAZDAR

## Jiyanname

**Hesen Nazdar:** le salî 1976 lenawçey tawgozî serbe helebce ledayk buweu-lesalî 1992destî benûsîn kirdûh , lebwarekanî (çîrok wlêkolîneweu wtaru wer-gêran whonrawe) denûsêt ,xawenî çendîn ktêbelem bwaranedawêstaş leşarî helebce nîştecêye, cgelenûsîn ,mamostay zmanî kurdîye lewşareda.

## Helebce

helebce naçêt bo bexa
çûn le hawînî temenya
be gazî reşî kîmyawîy
le baweşî sewze gyada
be bê kesî şehîd kira
bo ye bexda...
debêt be serî şorewe
le berdemî peykerekey
omer xawer krnûş bba
daway lêbûrdinî lê bika.
...............................

beyanyek hêroşîma w nagazakî
beclî reşî prsewe,,
le helebce leser..
glkoy şehîdekan ,,
berêzewe herdû westan.
destyan besngewe girte w
tund tund herdû çawyan nûqand
firmêskî be xuryan dabarand,,
gutyan: nefret lew kesebê
ke em gulaney helwerand,,

## Helebçe û şanzeyî Sê

1
Le ser şaşey
sînemakey helebcewe
le şanzeyî sê,
fîlîmêkyan xistiwe te ser
heta êstaş tewau nebweu
pîşan edrê.

2.
hemû rojê demew beyan
perçekanî baxî mîrî
şane dekird sruey beyan,
keçî rojê lay êware
reşebay şûm pelkekanî
bo hemîşe le bin qirtan
kezyekanî hel prûzan.

3.
pêş şanzey sê
kanyekey kanî aşqan
firmêskî xoşî deweran
le duay ewe frmêskîşyan
le çawekanî eu toran.

4.
bemşarî rqêkî reş
herdû qaçyan le bnewe
bo brîwe helebce,
keçî hêşta her nazekaw
hengaw denê weka lence.

5.
helebce
hawarêkî cawîdanew
her rojew horeyek eçrê
belam kes nye
guêy bo bigrê.
6
helebce
kiçêkî cehêlew
hemû şanzey sêyek
mare debrdrê w
ahengî bo saze krê
belam leduay ewe
bo hemîşetelaq edrê.
7.
pêş şanzey sê
le rojmêrî helebce
tenha yek çwar şemey tyaîh
belam lew roje bedwawe
hemû rojêk çuwarşeme ye
zamekeşî her besoye.

# ÎNCÎ EGÎD

## Jiyanname

**Încî Egîd;** Di 1967a li gund ê navçe ya Mûşê Melezgirt hatîye dinê. Di jîyana xwe de qet neçûye dibistanê. Di temenê xweyî piçûk çar pênc salî hînî nivîs û xwendinê dibê û dev ji pênûs û kaxizê bernade. Ew dem û ev dem e dixwîne û dinivîse. Jê bipirsin; 'di jiyana te de çi nebe nabe?' Bersîv, 'sedî sed xwendin û nivîsandin'... Ji salên nodan heya niha gellek helbest û nivîsên wê yên cûr be cûr di çapemeniya kurdî de hatine weşandin. Di navbera salên 1992an û 1995an de di rojnameya Kurdî ya bi navê Azadiya Welat de, bi awayeke çalak rojnamevaniyê dike. Încî Egîd dayîk a çar zaroka ye (du law du keç) û li Kurdîstanê dijî…

## Berhemdarî

Tu (Helbest, Weşanên J&J, 2014)
Şevê (Helbest, Weşanên J&J, 2019)

# Helebçe

Zarokek ber pêsîra dê,
Ew razayî,
Dê razayî çav vekirî.
Li rû dinê,
Mirovahî di xew de mayî,
Çav vekirî.
Ewr û ezman reş û tarî bûn ji şerman
Li ser Kurdan bibû ferman
Zalimek ji wan zaliman
Wek carek dîsa ji caran
Pênc hezar kal li Helebçe razayî çav vekirî,
Pênc hezar jin razayî çav vekirî,
Pênc hezar zarok li Helebçe razayî çav vekirî…

## Ji Bo Helebçe

Ne Ereb ne Fariz im
Ji qewmê Arî neviyên Medî
Xam Kurd ez im
Lewma li helebça cinyazim

Ehmed Xan dibêje ger hebûya me îttîfaq ek
Ê xulame kurd bûna fars û ereb û hewd
Yekitî yek hebûya nemana dereng
Helebçe sîh du salî ye kurdino

Kurdistan qedim ware
Axa wê xas cewhere
Mêvan perwer û candare
Herçî ê ji axa wê nân xware
Sifre dane ber kêr xencere

Kujerooo bizanibe

Pir rêwî têre hatin çûn
Pirî jî weke te kujer bûn
Demek hatin vîali wîalî bi mevanî
Çav berdane kurdistanê
Bi tewle bazî
Ji her çar hêlan hatin ne çûn

Amed kirin diyarê bekir
Beko ewan mal xerabo mala me bi wan re parve kir
Xencer çikandin li ser dil
Ala xwe pêve kirin
Dil dijenî di zarîya ji ber çirûsk kom dikirim
Jan di jenin jen a janê ji tenetî

Li çar hêla em bin destin
Çar perçe li ber qetilamê
Carê li cî kî dewrane
Şîn û girî û fermane
Hêsirê me hemî xuşk û birane

Hêsir ji çav napirse tu çi qewmî çi milletî
Dizane tu xwedî milk û milletî
Ne mesîhî ne misilman ne êzidî ne bê olî
Bi jan a xwe bi xweşî ya xwe tu jî wek kurd milletî
Çiya banî hatne ziman
Dibêjin zilma zalim ne ji rêzê ye li Helebçe dijware
Ji bo ku kurd kok bir bibin ji rû erdê
Bi bêhna sêva dagir kirin hilma ber pêsîra dê
Li min heram be êdî tam nakim sêvan
Ta ku bibînim yekîtî ya tim kurdan
Li Helebçe darê sêva bi çikînin
Demsal bû wexta guldanê
Cejna yekîtî ya kurdan li darxinin
Heta yekitî çê nebe
Bêhna we bi bêhna sêva bi çikîn in
Ez reben Încî Egîd dibêjim
Bin destî û mirin yeke ew barekî giran e
Bes 'bibin yek, hûn nebin yek, hûn ê herin yek bi yek!'
Gotin ê dawî şîreta seyda Cegerxwîn e.

## Poşk

Zarokno werin em çavgirtonek bilîzin
Ka xwe veşêrin min go sêv xwe veşêre
Min go hirmê derkeve
Poşk welat!
Poşk rizgar!
Poşk azad!
Sipas felat te em hemî sax kirin!
Cardin cardin bilîzin!
Welat felat
Rizgar azad
Min go karçîn derkeve!
Min go sêv xwe veşêre!
Poşk! poşk! poşk! poşk!
Em li Helebçe zarin
Ho dinya me bibîne
Ho neyar me bibîne
Em li ber kelehê ne
Me go jiyan derkeve
Me go sêv xwe veşêre
Poşk! poşk! poşk!

# OMER KERÎM BERZENCÎ

## Jiyanname

Omer Kerîm Berzncî, salî 1976 le Silêmanî le dayîk bûwe. Derçûy kolêcî kargêrî û aborî beşî kargêrîye le 1994ewe le buwarî rojnamegerî da kar dekat û cêgirî sernûserî govarekanî Zamuwanê, Berzencî buwe. Le çendîn govar û rojname da karî kirduwe wek serperiştiyar û berpirsî lapere. Xawenî komelêk şê'r û komelêk çîroke be zimanî Kurdî û çend kitêbêkî tuwêjînewew heme çeşn amadey çap in. Endamî karayî sendîkayî rojnamenûsanî Kurdistan e. Le çendîn festîvalî nawxoy herêmî Kurdistan da beşdar buwe wû wergirî xelatî duwemî şê'rî le festîvalî duwemî Hebîbe Xatûn ke le layen rêkxirawî tejnewe encamdira.

## Hewarêk Nemawe Bo Pêşû

na
babe
na
le dergay cengewe meçore naw mêjû
le dergay mergewe ravey jyan meke,
le ser xermanî çarenûs,
besêlkî xwên şen meke.
na
babe
na
le dergay mergewe ravey jyan meke,
çîtr sngî hewa bonî jyanî lênaye
çîtr sngî hewa sêwî jyan nagrê.
dar sêwekanî nîştîman,
eay nîştîman
uay nîştîman
min û to,
bebonî eu sêwane hêlncman dê
le demmewe kefêkî zerd dête derê,
çawm buwe befwarey xwên.
êsta lewê,
darî sêw wahêşuuy merg degrê
babe lewê, le xaç edrê,
daye lewê, çaw lêkdenê,
berew berzex heldefrê.

sûtanî balî newresekan
gewahî mêjuuy brîn û
çale syahekanî dozexe.
sedeyeke em baxçeye
bê baran û
sozî amêz wşk ebn.

delaqey asmanî em zame
le lîbasî xwênawî yusfêk eçê
paş krnûşî estêrekan bo mang
asman wek falçî yekî faşîl
qaweyekî grtewe
mangyan kuşt
xor helat bo derbendekanî qeder.

mûsayekî beguman buuyn
boye debû, xoman ya kêwî gur
bbête rejû.
bo gewahî mêjû namey brînekan
bo telqînî, bnyademekanî rê û rçey habîl w
le xaçdanî hzrî qabîl.

em karesate
qederî felsefey dîroke,
grî çarenûse...
yan felsefey qeder

tawanî pşîle çlêsekan bû
lîk be dem û lêwyanda ehate xwar
be çrnûk, ser çawey zemzemyan kwêrkirdewe
utyan dwandnî mang geme kirdine be agr.
leşe krîstalyekanî mangyan,
kirde qurbanî cenge bê nawnîşanekan.

eay le berdefrkêy mindalanî gerek
şûşe be pencerey malî mangewe nahêln
awênekan hemû hare eken eşkên,
bebê euey le nhênî şkanî wênekanman tê bgeyn
çon wêney wrd û xaş bûman ko bkeynewe
çon xoman, bo şerêkî nwê teyar keyn
çon dîrokî em zamane bnûsînewe

agavya, eu eşqe
tfeng û fîşek û narncok
ekate palewanêkî hemîşeyî
gilgamêşêkî nemlr
şervanekî çaw henguynî,
ke le şerêkî destew yexeda,
bû be: henarêkî perş û blaw
estêreyekî drewşawey şergekan
agavya, le jêr pelkî seruwe sewzekana
çendan estêreyan naşt
agavya, asmanekanî bext
le wrgî nahengêk eçn
hemû şitêkî tyaye umêd nebêt
eay le truskayî eu momane
gve gvî ba dête gwêm
ewe espekanî şorş
lekam heldêra eglên...

mirdîn hênde le şepolî deryakan man rewanî w
fêrî mele nebuuyn
neman twanî çîrokekanî xnkan bnûsînewe
êwaret baş agavya, êwaret baş
kemêkî tr eçîne ser prdî perînewe w
slawî maleawayî estêrekan esênînewe
yan le qulayî deryakana seferêkî ebedî ekeyn
bê euey fryaî maleawayî bkewîn
bê euey fryaî sendnewey slawekan bkewîn.

agavya, em mrdne le derya eçê
şepolekan, termekan...
berew qulayye nadyarekan eben.
pêeçê nawskî nahengê bbête dwa menzl
eay ! lew euynaney, melekirdinyan lê heram kirdîn
uay! lew serabaney, gulekanman tya maç kird
maç kirdinêk hîcretî fêrkirdîn
uay! hawrê mal awa
hewarêk nemawe bo pşû
wêstgeyek nemawe bo jyan
agavya, mal awa.........
dwa wêstgey jyane û xewm dêt
xewnêkî ebedî

polê estêrey werîw buuyn
le naw cergey cengekana
gurgekan, bonyan pêwe dekirdîn w
deyan lurand
çawerêy, jenerale bezîwekan buyn
helman bgrnewe û serşanyanî
pê brazênnewe.
welê, gerdelulî afat helî kird w
derfetêkî nehêştewe
hêy mêrûlekan, espekan le korjn dan
tozêkî tir rewe espekan dên w
şarekantan xapûr deken,
daye tîrîza em hemû cenge boçî
cengî nebrawey nêwan dayk û bawkman
cengî hewes
cengî xoşewîstî
cengî req
cengî reza qursekanî jiyan
cengî cwane lût berzekan.

agavya em hemû şikste çî lê keyn
hegbey em kewneş naygrêt
agavya,
şewekan balonêkî meznn
xewnekanyan
wek îsay bê menzîl w
bê nawnîşan helgirtîn
çawerwanî humayek buyn
le qulayî asmanewe
dabezêt w
eu xewnaneman pê bdatewe
hêşta le mjînî memkî daykman têr nebûbuuyn
lêyan dizîn
estêreyekman nebînî,
xalî bezîn, benaw çawanêwe nebêt
çî lew hemû espe şele bkeyn
le şkstî cengekan geranewe
cwanuyek nemawe
bman geyenête kenarekanî dlnewayî.
nêzey eu serbaze
le beynî cût sêwî kçêka
çawerêy fermane
mirdinî, kirdote peyamî euynê
le gerdûn gewretr.

agavya
hêşta xewnekanman, le gagolkê nekewtbûn
dartabûtêkyan bo danayne w
utyan tewau
eî peresêlkey
peragendey nêw asmanî
serabstan
şerabî kam rez mestî kirdî wa
slawî dawa mal e awayşit le bîr çû.

guve guvî reşebakan
kotrekanyan le gme xist
eay lew befre
sertapay zemînî poşî wa
buwarî neda,
danekanyan noş biken
uay lem payzî zemene
dartabutêkî mezne w
peykerî xwawendekanîş egrête amêz
hatn hawaryan kird
le baxî xwawenda çî ekey...
lem memleketî mergeda çon ejît...

jînî çî, pir jane
hawrê em baxane
gulêkyan tya nîye bonyan keyn
mestî em zemene çlkne bermda
nefretî xuda bû
yan qederî bext
lew deryaî mest bûney
helkêşayn
pêy wtîn ha tabût

meryem xan, tureyt
xencerî sersnigî îsaye w
rûsûrî bawan û qebîle.
nazanim bo asman naruxê w
bo zemîn şeqnabat le durît
lenaw em hemû demamkeda
wabaşe broyne naw tabût.

pê eçê şimşêrî qebîle
gerdn û gonay, çend gulêk
le xwêna xerq kaw
goranî bo mergî ewan w
rabûnî xoy bilê.
eay xuda
êre nîştimanî ê me bû
yan dergay krawey dozex...

bîrte eha em baxça ne
yek parçe nêrgise car bû
welê gerdelûlî merg helî kird w
mînay hemû gulekanî helwerand.
şkoy baxewanekanî şkand
eusa dar gêlasekan hênd zor bû
gşt nîgamanî prdekird, le zerdexeney jyan
keçî êstaş bo gêlasê
kewn maç baran dekeyn
rwanînman pr tarmayî ye
eay le fezay eu xewnane, çen bçûk bûn
cêy pepuley xewnêkyan tya nedebowe
çî le sîmrxî zemenî
dro bkem
grugalî minalîm bû
wek îsayekî nîgeran
wa be xaça helyan wasîm
çawerwanî çî le payzî kewn kem
reşebay merg
gelay temenyan werandim
zemen çeqoyekî tîjî,
destî serbazêk bû
duay şeqar şeqarkirdinî sersngî îsa
nefretî yezdanî, jî le mo û skl bû
beser termî îsa w
ê meda dabarî
bawerman be şnebay spêdekan nedekird
eyan wt zor naba
reşebay agrê hel ekaw
rewez û sertapay çyakan
ekate xole mêş

## Qederî Xewnekan

Le ser banîjey
qederî em bûne meweste
nebada wek çawî sewzî “helebce”
bedem bay em qutbî mergewe
bêwade helwerêy
wek dlî “mewlewî” helqireçêy
lawlawî euynî “nalî “bew
be bejnî ziravî “hebîbe”da helznê
nek qeder
destî reşî mergîş netwanê
ke ême lebaxçey euyna helkenê.

le ser banîjey
qederî em bûne meweste
nîgat hênde awêzanî derya meke
newek rengî şepol bgrîw
naxuday xewnm xerq keyt
le pencerey gumanewe
lew newrese koçerîyane merwane
lezerdeperî êwareyekî hawîna
pey benaxî derya deben w
ravey xewnî eu masîyaneman bo deken
pêyan waye nîştman cge le serabêk
amêzî sozanîyeke
bo gşt pyawê awelaye
pyawe şerîyekey nebê.

besîmay nurînta delên bo xwawend derwanî
heta zêdêkman bedatê
şerbekanî prbê le awî zemzem w
sêwekanî le henguynî mehebet
zêdêk dîrokî betal bêt
le helwerînî estêrew
nîgay karmamzekanî
durbê le rewezî guman.

# SEBRÎ VÛRAL

## Jiyanname

**Sebrî Vûral;** Di sala 1968an de li Dêrika Çiyayê Mazî ji dayîk bû. Ew jî weke hemû zarokên welatê xwe li ser axek xencerên devbirrek û neynûkê hesûdiyê li ser dilê wê diçêriya çavên xwe vekir. Dibistana seretayî, navîn û lîse li Dêrika Çiyayê Mazî xwend.

Di salê 1983 û 1984 an de li bajarê Eskişehir'ê zanîngeh qezenc kir.

Sebrî Vûral di temenê xwe yê ciwantiyê de helbestê bala wî kişand û ket pey gotinên efsûnî yên di nava helbestê de û meraqa wî hîn zêde dibû. Hestên Sebrî Vûral weke kalekî bigopal hêdî hêdî tevradibûn, bi daristan û kulîlkên axa birîndar re dilorandin. Di sala 1990 î de bi du rêzikên helbesta Melayê Cizîrî xew lê herimîbû. Ev xew herimandin bû sedema nasandina Helbesta Kurdî. Di pê re Feqiyê Teyran, Baba Tahirê Hemedanî, Ehmedê Xanî û Cegerxwîn nas kiribû. Ew jî ketibû nava deryaya helbestê û bûbû rêwiyê keştiyeke çongfisyayî û melêvantiya hestên birîndar û qêrînên bi şeple ji ser paxila axa welatê xwe dida hev, bi vê hewldanê kela dilê wî hêdî hêdî dest bi fûrandina helbestê kir. Gellek helbest û çîrokên wî di kovarên weke Çirûsk, Heftreng, Dilop, Nûbihar, Kund û Rojnameya Xwebûn de hate weşandin. Di rêwîtîya wêjeya Kurdî de dildarî û hewildayina wî bi awayekî çalak didome.

## Berhemdarî

* Bilûra Kerr, Helbest, Weşanên Belkî, 2015
* Wesyetên Qefilî, Helbest, Weşanên Lîs, 2019

## Helebçe

*Kîjan sêv dikare bêje;*
*ez bi qasî Helebçe sor im.*

Dilikumin hêviyên min,
Li şopa nalînên kal û birînên kevzgirtî û devzengar
Nepayiz bû nezivistan
Nêzîkî qewlê KAWA yê hesinkar
Hatibû bihareke xapînok
Gul û kulîlkên wê ji xerdel
Sêv û êmîşên bêhna wan bi jahr.
Dilxavî dibe, dixewir e
Di xewixe dîrok û demsal
Gêj e dem
Kor e çavên mirovahiyê
Nabînin qirkirina Kurd û Kurdistan
Kerr e, nabihîze guhên Cîhan!
Feryad a zahf û zêçan.
Dîsa Kurd, ji nav lepên xweda yên dil beraz,
Di weşiya erdê.
Hinek zarok hinek jin,
Yên din bav û kal!

Li Helebçê ji êvar de mij e
Laş lê rêzbûn in, xwîn bê agir dibirij e.
Îro li Helebçê Adareke mirî
Zahf û zêç neman e ku lê bigirî.
Kuçe û kolanê Helebçe tevde laş e,
Mêtînger, xwînmij qeraşê xwîna belaş e.
Dayîk û bavan,
Cara dawîn, li zarokan dikirin qêrîn û hewar.
Zarok bênefes, weke pelên zer payîzan diketin xwar!
Bi ser devên wan diketin kefa sar.
Ne gazî û ne hewar
Helebçe
Helebçe
Dilrêşîk,
Henav perçe perçe.

# Enfal

De ka!
Nepirsin navê qêrîna ji min.
Herin Çiyayê Şengalê
Gol û bendava Dokanê
Bi awirvedanê êvareke sewsî,
Berê xwe bide geliyê zîlan
Di demek lebikî de,
Silaveke birîndar bide,
Warê Cembelî yê Mîr (ê) Hekariya
Û
Vegere li Robozikî-ya
Hewarê wê digewrîya xwediyên xwe de radizan.
Bi xwînê bineqişîn e, eniya berfa mal kambax.
Û
Li bayêbezê vegere beriya KOBAN ê,
Neqebê asê,
Li şûna tepiltozana teqînên Arî (n) Mîr-ka-nan
Bilîrandina şiyar bikin qadê Nêrgizan!
Cihê! Birînan stran dibawişkadin li şevan
Bipirsin ji bêdengiya birakên şevê,
Ji dergûşê vala

Û
Ji p (êsîr) ên zerpitî diman li benda zaran.
Argûn
Qefilî û fedîkar diman,
Li hember xwînrijîn a ciwanan.
Bipirsin
Ji kenê, pitikên bi diqdiqa dina mirinê nîvçe diman.
Bi pirsin ji dîlana mêşên,
Li kodikê çavan govend digerandin.
Ji cuzûya sih û yekan a ji xwedê! hatiye dizîn bipirsin.
Ji cirdonên seleba û yên xwîna min di-
kir, bermahiyên talana
Û
Ji Enfalê bipirsin
Ji Enfal...

# ZEYNEP YÛSFÎ

## Jiyanname

**zeyneb yûsfî;** şaîr,romannûs,wergêr. rojhelatî Kurdistan. şarî sine. kurteyek le çalakîye edebyekanim

- kurth romanî" tamezroy leylê "sne,çapemenî kurdîstan,1998
- kurte roman û komele çîrokêk pêkewe,"şedey sergerdan" w"eîr wevîn wejdeha"yekemîn çap hewlêr, dh zgay aras 2003,dûhemîn çap sne,dezgay pertewî beyan 2004.
- ktêbî snaryo "çray trafîk." sne,dezgay pertewî beyan,2004
- romanî"sêberekanî mîra. " slêmanî , dezgay henar, 2005
- drûs kirdinî fîlmî 28 xulekî "kayh " taybet bh mindalan2006
- komele çîrokî" lh bazney teqedusda" slêmanî ,dezgay henar.2008
- ko şî'rî "lem nêzîkye da",hewlêr,dezgay aras,2012
- romanî "debê agam le xom bêt",hewlêr,dezgay aras2012
- le sine da dejîm û êsta le zanko xerîkî wergirtnî mastrem le komelnasî da.

## Şewgarî Helebce wn

karmamzekan
le dûy dilxoşkirdinî xewnêk
xaç we xaç
sawakan dehêne
daholekan le pirmey geriyan
darkajekan bîryan kwêr
kulmî xot sûr
be xwênî henarêkî helebceyî.......
klaw bke ser reşeme
helebce le dergakan
ba frokekan bimrin
eger asman dûr....
le rêy frîwêkî syasîyewe
newroz dawerêne ser
termekan
çi jn û mindal heye
xew
dawên dawên firmîsk
eger zewîn sext..........
hemuuy xetay zmzmekan
le asmanewe
xwanî hejaran pr le xrke berd
eawrî kwanuyan sard
leşî reqhelgerawyan
tur bde nêw dem zuqmstanewe
helebce mandû
serdenête sînkî reşemewe
ba hîwakan bmrn
eger newroz bê newroz.....
be dem teqqeyekî pr gumanewe
qelî qeşqe
helxrêne ser dartelêk
qarey şehîd

bqrêne denûkyewe
tenya lerêy frîwêkî syasîyewe
xwênî sûr le
qedubalay helebceyek
ba rêkewtnamekan bmrn
egercînusaydêk beser helebceda...........
daykt naçar bke
yapraxî gemjeyî lênêt
bo xwanî cn wperîye befrînekan
helebce bî guman man
sêberekan le çeple lêdan
ba narcokekan....
ba kîmayî......
ba hera wnza......
ba şehîdekan şehîd....
be klkî kolareyekî syasîyewe
helebce bê guman maaaaaaaaaa-
aaaaaaaaaaaan....................

# EDNAN DOGAN

## Kurtejiyan

**Ednan Dogan;** di sala 1964 an de li bakurê kurdistanê bajarê Mêrdîn navçeya Nisêbînê li gundê Wêsîkê ku îroj bi navê (kuçeya Abdilqadirpaşa tê dinasîn) hatiye dinê. Dibistana xwe ya seretayî li gund qedand û li Nisêbînê dibistana xwe berdewam kir. Ednan Bi eslê xwe ji gundê Dêrikfanê kû girêdayî Kerrcosê ye. Ji hinek sebeban nikarîbû zanîngehê bixwîne. Di sala 1981an de di temenê biçûkahî ya xwe de dest bi karê ticaretê dike û di sala 1983 an de dema li kargeha xwe bû, ji alîyê leşkeran ve ji ber kû alîkarïya sîyesetvan û şoşgeran kiribû tê girtin. Di vê girtina xwe de, li (tabur) baregaha leşkerî ya Nisêbînê bi Qatilê kurdan Velî Küçük re ru bi ru tê û dû hefteyan di vê baregah a Nisêbînê ya leşgerî de êşkencê dibîne. Di pey 2 hefteyan de tê berdan. Ev girtina wî bandorekê li ser dike. Di pey girtina xwe de Karê sîyasî kû her çendî ne gelekî bi zanebûn be jî, lê ji bo xatirê mirovên xwe dikir, êdî bi zanebûneke netewî dike. Ednan her tim nêzî tevgera azadîxwaz e û di nav lêkolanîyekê deye. Hetanî sala 1991 an, bi van hestan ew jî bi ber pêla tevgera azadîxwaz, di rîya xwe de berdewam dike. Di 1991 an de careke din li Nisêbînê tê girtin pêşî li Nisêbînê û paşê jî li Mêrdînê carekedin bi êşkencê re rû bi rû dimîne û ber bi zîndana Amedê ve diçe, lê demeke gelekî kin dimîne û bi şertê kû li derve bê darizandin tê berdan. Ednan helbesta xwe ya yekem di 14 salîya xwe de di nîvisêne û hetanî sala 1990 an helbestên xwe bi tirkî û li ser zor û zahmetîya evîndarî û hejarîya der û dorê di nîvisênê. Lê gelek helbestên Ednan di dema kû tê girtin ji alîyê malbatê ve di nav pirtûkên wî de ji bo kû ne kevin destên polîsan de têne şewitandin. Ednan di sala 1992 an de weke gelek kesên kû ji ber dagirkerên kurdistanê mişext dibin, vê carê berê xwe dide xerîbîyê û pêşî li Mersînê bajarê tirkan û di pey de jî li Swêd ê bi cîh dibe. Ji sala 1993 an hetanî nuha li Swêd jîyana xwe berdewam dike. ji dema ku hatîye Swêd, hetanî nûha li derveyî velat, di nav gelek beşên xebatê komaleyî de weke şano, çand, civakî û hûnerî de cihê xwe digre. Helbestên Ednan li ser medya civakî bi dengê wî têne guhdar kirin. Ednan ji bilî helbest, tekstên stiranan jî, li gelek ozananan belav kirine û tekstên wî bi awazên hûnermendan ji alîyê gel ve têne guhdar kirin. Ednan li swêd dibistana bilind ya ekonomîyê ya şerîkê (şirketê) di qadîne û di nexweşxanê ya lêkolanîyê de di karê plan û butçe yê de kar dike. Ednan zewicîye û bavê sê zarokan e.

**Berhemdarî**

* Çavên Zeytûnî (Helbest, Weşanên J&J, 2016)

## Helebçe

Pêşî dengek hat,
Ji qîrîna dayika min bilindtir bû;
Guhên min kerr bûn.
Guhên min kerr nebûbûna
Ez ê ber bi dengê dêya xwe ve biçûma.
Nedimirim!
Bavo bi destê min girt,
Destê min ji milê min qut bû û bi bavo re çû.
Destê min qut nebûbûya ez ê bi bavo re biçûma.
Nedimirim!
Herî dawî çavên min hew dîtin
Û çokên min hew li min guhdar kirin.
Her der qetran qetran bû!
Çavên min bidîtana û çokên min li min guhdar bikirana,
Min ê bida pey şûna yên din.
Nedimirim!
Lê ma ne jixwe xelasî nemabû,
Em hemû miribûn.
Ez, dayê, bavo û yên din..!
Û HER DER BÊHNA SÊVAN BÛ…

## Helebçe Me

Alayekî xweş welatim, li çar aliyan xelatim
zar û zêçim kal û pîrim, wek hevrîşim diherikim,
Helebçe me, Helebçe me,
bonî sêwim, Helebçe me,
Helebçe me, Helebçe me,
Kurdîstanim, yek parçe me.

Xewnî şîrîniyan tal kirdîn, newroziyan siyaposh kirdîn,
beyanyan qatil kirdîn, herçwar layan wêran kirdîn,
min Helebçem min Helebçem,
bonî sêwim min Helebçem
min Helebçem min Helebçem,
min Kurdîstanim, yek parçem.

Dîsan behariyan jakandîn, hawarîshiyan negeyandîn,
çawî korpeyan rijandîn, wilatmanyan lê giryandin,
min Helebçem min Helebçem,
bonî sêwim min Helebçem
min Helebçem min Helebçem,
min Kurdîstanim, yek parçem.

Deşt û newal çiyan girî, xaka pîroz reng xerdelî,
demsaleke winda kirî, mamê pêcek himbêz kirî,
Helebçe me, Helebçe me,
bonî sêwim, Helebçe me,
Helebçe me, Helebçe me,
Kurdîstanim, yek parçe me.

Katjimêran dagerînim, zarwan serhişk bi lorînim
canê şêrîn bibexşînim, welatê xwe birevînim,
Helebçe me, Helebçe me,
bonî sêwim, Helebçe me,
Helebçe me, Helebçe me,
Kurdîstanim, yek parçe me.

# BARÎ MEHDÎ

## Şanzey Sêye

şanzey sêy û zamî dlm kulayewe
wêney şehîdanî şarm le mêşkm heldrayewe
şanzey sêye û matemî cestey brdûm
bonî sêw le pir hatû polê şehîdî birdûm
le hemû şanzey sê yekda daykî şehîd hawar eka
umêd le dlîda mawe û çawerêy kes û kar eka
brwanakat le çrkeyek pênc hezarî le dest dabê
elê leser em zemîne ştî wanebuwe û nabê
ezann bo brwa naka leber euey hepesawe
lem rojeda sedan kç û kurî cwanî le dest dawe
rojêkî şûm û negbet bû bo helebce û bo Kurdistan
şanzey sê ye û eu roje bû ke kurdî be cîhan nasan

# OCCO MAHABAD

## Jiyanname

**Occo Mahabad;** helbestvan, bernamenûs, wergêr û nivîskarekî Kurd e. Occo Mahabad di sala 1977an de li Wanê hatiye dinê. Piştî qedandina zanîngeha Stenbolê dest bi nivîsandinê dike. Her weha di kovarên wekî Çîrûsk, Asiva, Pengav de nivîs û helbestên wî hatine weşandin, dîsa pir malperan de nivîskariyê kiriye û nivîsên wî hatine weşandin û belavkirin. Ji xêynî helbestan ji bo fîlmên biyanî binnivîs amede kirine. Pir fîlmên biyanî ji aliyê Occo Mahabad ve hatine Kurdîkirin.

### Çend fîlmên ku ji aliyê wî ve hatine Kurdîkirin:

–Malena
–Rabbit Prof-Fence
–The Road to Guantanamo

Her wiha Occo Mahabad bi xebatên xwe yên teknîkî ve jî tê nasîn. Heta niha gellek bernameyên kompîturê ji aliyê wî ve hatine Kurdîkirin. Ji bo standertkirina zimanê teknîkî bi salan e xebatan çêdike.

Ji bo fêmkirina jiyana teknîkî e-pirtûkek jî amade kiriye. Pirtûk bi navê Nivîsên Teknîkî li ser malperan tê belavkirin.

Çend bernameyên kompîturê ku ji aliyê wî ve hatine Kurdîkirin:

–WinRAR
–Ccleaner
–Revo Uninstaller

Ji bo ku termên kompîtûrê were nasîn xebata Ferhenga Termên Kompîtûrê ji aliyê wî ve hatiye nivîsandin. Ev ferheng wek dosyayeke pdf li ser malperan bi belaş tê belavkirin.

Bi armanca ji bo gel hunereke bêpere, albûmên helbestan çêkirine. Hemû mafên albûman aîdî gel e, albûm li ser înternetê bêpere tên daxistin û guhdarîkirin.

### Albûmên wî:

–Helbestên Dînik
–Dem
–Helbestên Bijare

Occo Mahabad bi helbest, werger, nivîs û gotarên xwe yên cur bi cur jiyana me ya Kurdewarî bi xebatên xwe yên domdar ronî dike.

**Pirtûkên wî**

* Helbestên Dînik, Helbest, Weşanên Ava, 2012
* Êşên Qehbik, Helbest, Weşanên Do, 2013
* Rondikên Binevşê, Weşanên Do, 2016
* Dem, Helbest, Weşanên Na, 2017
* Bi Dizîka Were, Helbest, Weşanên Na, 2018
* Antolojiya Helbestvanên Nûjen (Kurmancên Bakur) , Lêkolîn, Weşanên Na

## Ev bû...

Bajarekî şewitandî
Mirovên kuştî
Der û dorên bombekirî
Evînên qedexekirî
Ev bû jiyana min
Ji ber hezkirinekê
Min dikirin Îsa
Dihatim kevirkirin
Li nava meydanê dadiliqandin
Bi gunehên hezar salan dihatim sûcdarkirin
Ji ber sewdayekê
Li nava meydanê dihatim şewitandin
Civatek bi kuştina min xwe paqij dikir…

## Min…

Min birîn berhev dikirin
birînên zarokên sêwî û bêxwedî
min êş kom dikirin
êşên dêlikên birçî û tazî
min derd vedişêriyan
derdên kesên tenê û perçiqandî
Ez dibûm dengê bindestan
min ken û xêmgîniya wan dianî zimên
Bi wan re digiriyam û dikeniyam…

## Min bibe...

min bibe cihekî dûr
ji vî bajarî dûr
ji van mirovan dûr...
keziyên min ên reş bibe
dêmên min ên sor bibe
xeyalên min ên birîndar bibe...
êşên min bijmêre
hêstirên min vexwe
eşqa min veşêre...
min bibe... min bibe...

# ÎHSAN BÎRGUL

## Jiyanname

**Îhsan Bîrgul;** ji Agiriya Serhedê ye. Li mezraya Tarimê ya li ser gundê Meyayê (Bi navçeya Giyadîn a Agirî ve girêdayî ye) hatîye dinê. Nêzî deh salan e xebata li ser zimanê Kurdî dike. Di çend kovaran de nivîsên wî hatin weşandin. Niha jî li gorî derfetan di malpera înternetê ya bi navê “ Diyarname” de dinivîsîne. Li gel xebatên Kurdî zaningeha Anadolu beşa “ Pêwendiyên bi gel re û reklamvaniyê dixwîne...

## Berhemdarî

* Gotinên Nîvcomayi (Helbest) , Weşanên AVA, 2018 - Amed

## Kenê Qerisî

*Ji bo mirazên çavdemayî*

Şahî;
Rojek ji rojên derbiharê
Li dorhêla çol û çiyan arzebayek
Li derê malekê dewatek
Li dewatê zemawendek coşî
Ken û xweşî li rûyan

Kêfxweşî;
Êvareke hênikhewa
Bûkek rûbixêl, desthine
Zava lewend, simbêl li çene
Ketin ode, odeya dil
Destpê kir şev, hev aliya dest û mil

Keraset;
Borandin şevek tijehest
Raketin dilxweş û mest
Sibeyê deng li wan kir
Çav vekirin, pozşewat...
Razan bi bêhna sêvan
Nav nivînan bûk û zava
Xêlî hilavîstî, ken li ser lêvan...

# FATÊ TAŞLI TÛNÇ

## Jiyanname

**Fatê Taşli Tûnç;** di sala 1967an de li Amed ê navçe ya Rezan hatime dine. Dayika 7 zaroka me, ji malbatek kurdperest û welatparêz im. Li ba bav û kalê xwe bi helbestê Cegerxwîn mezin bûm. Helbestan dinivîsim û dixwînim. Çîrokê gelerî û sitranê gelerî zanim. Li gund û gundik, bajar û bajaroka li pêy çanda Kurd digerim û bernama 'Jîyana Dayikan' ji televîzyonê re amade dikim. . .

## Helebçe - I

Rojekê biharê ya geş
Gul û kulîlk li daran
Cihê seyraneyan xweş
Teyr difiriyan li ezman

Dengek bi xof bilind bû
Dabûn dû hev teyaran
Mij û dûman ezman girt
Qerepere ket malan

Zar û zêç li erdê ketin
Bû qêrîna dayikan
Mirinê rûyê reş rêda
Bava xwe avêt ser lawan

Çi derdeki girane
Jibîr nabe bi salan
Birîna Helebçe kûr e,
Bû derdê ser3e derdan

Şermeke hevpar e ev
Eyba hemû mirovan
Mirovahî lewitî
Kete binê pêlavan

## Helebçe - II

Pêlav li dû lingan man
Di mirinê de gevizîn can
Melkemotê bê îman
Em xistin rewşek giran

Te kir dojeh ev diyar
Te kir û te dît ey zilimkar
Melkemotê mirinê
Zilma te serê te xwar

## Helebçe - III

Şanzdehê meha adarê
Rojeke derbiharê
Taviyek ji teyarê
Baranek ji xerdelê
Barandin li Helebçe

Qêrîn û awaz tepisîn
Can bi gazê fetisin
Gul û giha çilmisîn
Teyr û tilûr perpitîn
Bê xwedî ma Helebçe

# Helebçe - IV

Li ser axek birîndar
Bi hezara ketin xwar
Zarok û ciwan û kal
Yên ko çûne bê birîn
Yên mane tev bûn hejar
Sotine xaka pîroz
Bi bombe yê kimyewî
Ev çend sale naqede
Vê birîna bê xwedî
Derdê giran HELEBÇE

## Helebçe - V

Ji xafil de
Bi cerdek bêbext
Mirin barandin
Qefle bi qefle
Jin û mêr
Zar û zêç
Pîr û kal
Ketin erdê bêhal
Û dinya ker û lal
Ne hal û ne hewal
Ne mirov man
Ne ajal
Hey Adarê
Hêlek te şîn e
Hêlek te şahî
Hêlek te qêrîn û girîn e
Hêlek te bihara rengîn e
Lê Helebçe di dilê me de
Her û her birîn e
Xefe, derd e, zarîn e

# SEYDAYÊ DILXWÎN

## Jiyanname

**Seydayê Dilxwîn;** di sala 1988an de li gundê Cofitnêya ku li ser navçeya Licê ye hatiye dinyayê. Dibistana seretayî û navîn li Amedê xwendiye. Piştî dibistanê li gundê xwe feqîtiyê jî kiriye. Di 24 saliya xwe de bi malbatî hatiye Amedê bi cî bûye. Di nava gelek êş û zehmetiyan jiyaye. Di nava xebatên ziman û çand û wêjeyê de cî girtîye. Her wisa bala wî li ser wêje û helbestê bûye. Di 18 saliya xwe de dest bi helbesnivîsînê kiriye. Di heman demê de dengbêjiyê jî dike. Hê jî dengbêjiyê didomîne û helbestên xwe distrîne.

## Berhemdarî

* Tîra Eşqê (Helbest) , Weşanên J&J, 2019 - Amed
* Perîya Gelî (Çîrok) , Weşanên J&J, 2019 - Amed

## Êşa Helebçe

Hezar nehsed heştê û heşta bû
Gelê wî nav zevî û deşta
Serê wan hate xum xuma teyara
Qedera helebçê li wê reş da bû

Bêje dayê birîndarim daye
Çima îro dengê me der naye
Li helebça me bûye ferman
Felek xayîne ji mer nemaye

Ax dayê helebçe bi qêrîne
Zar û pîr kal û ciwan mirîne
Bi teyaran me ferman ra kirin
Li me kurda kirin qetil xwîne

Lê dayikê helebçe bi êşe
Salê carek êşê di givêşîne
Ew birîna bi komkujî
Dilê me da bûye kom û kêşe

Birîna helebçê nabe ji bîr
Kesê ku bi wan re û hebe xîr
Ji bîr nake ev êşa bi ferman
Ev kuştina ciwan û zar û pîr

De lê dayê ez seydayê Dilxwîn im
Ji êşa helebçê bi birînim
Bi şev û roj û meh û sal
Tim ji dilê birîn di xwînim

# MEHMET ŞÎRÎN BULGA

## Jiyanname

**Mehmet Şirin Bulğa (Mîrza Mehemedê Şêrwî)** ; Di sala 1968'an de li gundekî Şêrvanê (Qalinz) ji dayik bû. Dibistana seretayî du sal li gundê xwe, ê din jî li navenda Sêrtê xwend. Navbera salên 1984 û 1987'ê de dibistana amadeyî li îskenderûnê xwend. Navbera salên 1988 û 1992'an de li bajarê Enqerê zanîngeha Gazî'ye de beşa Mobilya Dekorasyonê kuta kir. Ji bilî vê beşê, beşa Sosyolojîyê jî kuta kirîye. Navbera salên 1992-1995'an de li îdirê, 1995-1998'an de li Sêrtê li dibistana amadeyî (Endüstri Meslek Lisesi) Mamosteyî kir. Sala 1998'an de ji ber xebatên sendîkaya Eğitim-Sen ê bi raya rewşa neasayî hat sirgûn kirinê Derya Reş (Artvin/Arhavi) û piştre ji ber neewlehîyê mecbur ma ku ji karê xwe îstifa bike. Navbera 1999-2002'yan de li şaredarîya Sêrtê şêwirmendîya karên teknîkî kir. Di sala 2005'an li Dadgeha Mafê Mirovan (AİHM) dawe kar kir û ji nû ve vegerîya ser karê mamostetîyê. Navbera salên 2005-2009'an li Geverê, 2009-2010'an li Cizîrê, 2010-2016'an li Sêrtê mamosteyî kir. Ji ber ku bi biryara navenda sendiqaya xwe piştevanî da çalakiya bi navê " Em Li Hember Şer Aşitîyê- Li hember Mirinê Jiyanê Diparêzên" ev çalakî kirin mehme û 29'e Kewçêra 2016'an de bi daraza qerarnameya hejmara 675'an ji kar hate avêtin. Hîna rêveberê navendi ê Eğitim-Senê ye.

## Berhemdarî

* Maviydi Mayıs - Üşüyen Şiirler (helbest) 2007 - İstanbul
* Gerzevêl'in Tanıklığı – Süleyman'ın Çığlğı (Roman) , Weşanên Tevn, 2018 –İ stanbul
* Cêwîtîya Helbestan (Helbest) , Weşanên Tevn, 2018 - Stenbol
* Dayika Du Dil (Çîrok) , Weşanên Tevn, 2018 - Stenbol
* Ji bilî van berheman, hin helbestên wî di rojname û kovarên cuda de (Siirt'te Sonsöz, Siirt'ten Öte, Siirt News, Emekçiler Formu, Tîroj, Evrensel Kültür) hatine weşandin.

Çîroka wî a bi navê "Gula Mîrza" 9. Pêşbaziya çîrokan a Şerzan Kurt de xelat girtiye.

## Ez Zarok Bûm

Zarokatî ya min ji min dizîn
Ne bûm xwedî qaqekî
Ne jî dilşadiya zarokane
Ji tehma şekir mam bêpar
Û bîreweriyên min kuştin.

Min xwest bafirroka bifirînim
Gotin “qedexeye” efendiyan!
Li dewsa şekirê qulo qulo
Gule îkram kirin bi devkenî
Şûna lorîkên dayika min
Dengê mîtralyozan vergirtin
Bi wan dengên Xwedênenas
Niviyam, hilpekiyam
Li erdnîgariya evînê
Min bi mirinê dan nasandin.

Ez Xezal bûm
Xezala çiyayê Şerefdînê
Herî rind a gund
Yektaya dayika xwe
Şeveqeke biharê
Derketim nêçîrê
Nêçîra kulîlk û pincarê
Di rojek a Adarê

Kuçikên xwe kişkirin
Hatim parçe kirin
Rijandin rondikên cirnîsî
Lê devan de dilşadiya girêzî.

Ez Lorîn bûm
Pitika sê mehî
Pitika Helepçeyî
Hê têr nebûbûm ji şîrê dayika xwe
Li min dan vexwarin
Bêhna sevên kîmyevî
Xeniqîm
Mîna xuşkên xwe yên Hiroşimayî

Tenê bûme wêneyek
Di kartpostalên bêxwedî de
Hatim daliqandin
Li ser dîwarên bêhnkils de.

# NEZEHAT DOGAN

## Jiyanname

**Nezehat Dogan;** Li Nisêbîna Mêrdînê hatiye dinyayê. Di temenê biçûk de dibe bûk û derbasî Qamişlo dibe. Li wê derê ji derd û keserên xwe re risteyan diristîne. Heta niha kul û kederên xwe û derd û evînên xwe bi helbestan aniye ziman. Ew niha li Swêdê dijî. Li deryaya helbestan ajneyan dide…

## Berhemdarî;

* Demsalên Şikestî, Helbest, Weşanên J&J, Amed, 2018
* Çîroka Emrê Min, Helbest, Weşanên J&J, Amed, 2018

## Helebçe

De ka bêja,
berê xwe bidim kîjan alî?
Pişta xwe bidim
ber pala kîjan kêl ê
û li ser kijan navî
binehwûrên im lêê.
Berê vê sibehê
di şewişim li nav taxên te,
gavê xwe li ser rê
û rêçikan jibîr dikim.
ez kor im xwe nabînim lêêê.
De bêja kijan zarokê
ji pêsîrê xwe têr bikim
li morîya şîr digerim
wê jî nabînim, giryane bajaro.
Bêja!
Kîjan navî li xwe
bi pêçênim
kezeb li min
parçe parçe dibe
dema ku laşan dihejmêr im
bajaro.
Dixwazim zarokan
di hêlana dilê xwe de
bihejênim û bilorîn im
Lê biser lorîkan ve venabim
lal im pismam
lal im.
Howax... Ev bajar bê deng e,
biskên hinekirî
li benda nêrgizê adarê bûn
vê sibehê di bin pêrîyen
nêrgizlokan de

bê deng in
Ev bajar çiqas cemidîye bira
serma ke bi seqama
ne teyroke e
ne baran e
û ne berf e
bitikî tenê me çîroka min
xûmama mirinek nîvkûştî
ketîye ber herdû çavan
dibe ku şevder bimînim
li van xerabcehe
Xamdarim,
xembarim
Xwelî li ser im.
Vê sibehê
dolabrêsan tevna êşa
li darxistine.
Gotin hevdû xwerina.
Tu jî bi henasên qut kirî re
dibilênê berê vê sibehê
bajaro.
Ax! Kulê min bûn çar tew
jihev kişîn vê sibehê
de bere ez jî bimrim
û de bere her çar derîyê
birayê min jî werin girtin
Jiber ne xilq xilqa wan e
û ne jî kilît kilîte wan e.
Ez û tu diqufilin
li sikakên vî bajarî,
Çîroka emrê min
em bitikîtenê ne.

## Helebçe

Bêdengiya te min gêj dike
Û rê li ber min winda dike bajaro
Ez dimeşim û dimeşim
Lê bê yî ku lingê min
Li toz û kevirê te bikeve bajaro
Biştexile bajarê bêdeng, biştexile
Şîretekê li min bike
Ez asîman nabînim,
Ewrên reş stêr fetisandine
Û roj jî di gola avê de pûnijiyê vê sibehê
Gul û zûrçik reng bêreng mane
Nêrgizan serî tewandine
Û bejna wan bûye wek sing û taxe
Û sekinîne di cihê xwe de bajaro
Dengê zarokan û lorînên dayika jî tevizîne
Êdî bihar miriye li vî bajarî
Ez bi bêhna pîşo dihatim ser hişê xwe
Min li dorhêla xwe meyze dikir
Ez wek biyanîkî kor û lal pêxwas
Wek belengazekî ku rê li ber windayî ye
Ez dimeşiyam û dimeşiyam li nav te bajaroo
Ma tu li ku mayî çîroka emrê min?

# OMER DILSOZ

## Jiyanname

**Omer Dilsoz;** Di sala 1978ê de li gundê Gûzereşa Culemêrgê hate dinê. Li gund dest bi xwendinê kir. Lîse li Culemêrgê qedand. Demekê hevseroktiya Komeleya Nivîskarên Kurd jî kirîye. Ligel karê nivîskariyê rojnamegeriyê dike û li bakurê Kurdistanê dijî. Herweha di gelek kovarên wekî Gula Tamara, Nûbihar, Tîgrîs, Vesta, Kulîlka Ciwan, Kovara W, Çirûsk, Peyv, Nûbûn, her wiha rojnameya Azadiya Welat û Tûrik û hin malperan de wekî; www.yuksekovahaber.com, www.nûkurd.com nivîsên wî yên li ser mijarên aktuel û edebî tên belavkirin.

## Berhemdarî

* Hêviyên Birîndar, Roman, Weşanên Aram, 2003
* Bêhna Axê, Roman, Weşanên Berçem, 2005
* Bila Gotineke Min û Te Jî Hebe, Helbest, Weşanên Berçem, 2007
* Neynika Dilî, Roman, Weşanên Aram, 2007
* Berbiska Zer, Roman, Weşanên Avesta, 2012
* Hevrazên Çiyan, Roman, Weşanê J&J, 2014
* Ez û min, Roman, Weşanê J&J, 2016
* Gêjevang, Roman, Weşanên Lîs, 2018

## Dîmena Reş Û Spî (Helebçe)

dîmeneke reş û spî
ji nav rojnûskeke qurmiçî
ji rojên bihareke nûpişkdayî
min dît
di çirûska çavên te de
erê keça Helepçeyî
min dît
zêmar û hawar bû dayikan
li ser cendekên parçekirî
'kurê min... keça min
ax ez gorî, dayik nemîne
ma çi hawara te bû!'
erê keça Helepçeyî
ji nav çavên heyvê
di nava fêrmiska ewran de
wekî birîna xerdelê bariyayî
û ketiye nava dilê min
lê venûsiyayî

# NECAT BAYSAL

## Jiyanname

**Necat Baysal;** nivîskarekî kurd e. Di sala 1988an de li gundê Gurika Mêrdînê (Nisêbîn) hatiye dinê. Ji ber sedemên siyasi di sala 2009an de hatiye girtin. Bi giştî pênç sal û niva di Zîndana Tekirdaxê de girtî maye. Niha li Almanyayê dijî û xebatên xwe yên wêje yî berdewam dike.

## Berhemdarî

* Paytextên Êşê, Helbest, Weşanê J&J, 2016, Amed

## Paytextên Êşê

…

Ji başûrê Leylayan
Dengê zarokekî tê guhê min;
“di kuçayên Helebçe de
Bi bayê sêvan dimirim
Destê min
Li ser pêsîra diya min
Hişk û ola dimînim
Bi çavên vekirî
Bi rondikên ziwazer
Û bê lebat”
…

# SULTAN YARAY

## Jiyanname

**Sultan Yaray,** di sala 1971ê de li Şemrexa Mêrdînê hatiye dinyê. Piştî dibistana seretayî û navîn lîse ji derve de qedandiye. Zewicî ye, 4 zarokên wê hene. Sala 2008an li Kurdî-Dera Amedê tevli kursên zimanê kurdî bûye. Ji pola yekemîn heta asta mamostetiyê bi serkeftin beşdarî kursên zimanê kurdî bûye. Serdemekê mamostetiya zimanê kurdî kiriye û di rêveberiya Kurdî-Derê de jî cih girtiye. Ji bilî xebatên zimên di rêveberiya HDP a Kayapinarê (Amed) de cih girtiye. Di meclisa KCDê beşa Ekolojiyê de beşdarî xebatan bûye. Endama Koma Helbest û Xwendinê ya Amedê ye. Niha çalakgeriya zimanê kurdî didomîne.

## Berhemdarî

* Bêyî te (Helbest), J&J, 2019-Amed

## Helepçe

Behna sêva kemîn e
dijmin me dixapîne
neçin zarokno neçin
ev bêhn bêhna qiyametê ye
Dehaqên hemdem
têr nabin ji mirina me
ma hûn nabihîzin
Helepçe hîn dinale
li ser me hîn ferman e
Kurdistan tim birîndar e
zarokên wê bê çare
ji ber neyar diqîrin
geh Helepçê
geh Zîlan
geh Kobanê
geh Efrîn
kurdên bê guneh û bê sûc
mane bi tena serê xwe
çi digot Seyda Cegerxwîn
‘’heta em nebin yek, em ê herin yek bi yek”
kurdno!
werin em bibin yek
da ku em azad bin ji dest neyar
em jî şad û bextewar bin
bê qêrîn û bê girîn
Helepçe ne do ye
îro ye.
Li ser dila dinale
bi qêrîn û hewar e
lekeyek reş e
li ser eniya neyar e
ma hûn nabihîzin

Helepçe hîn dinale…

# A. BEDIR

## Jiyanname

**A. Bedir;** di sala 1981ê de li Geliyê Zîlan a girêdayî navçeya Erdîşê ku bi ser bajarê Wanê ve ye ji dayîk bûye. Biçûktiya wî, li zozanên Geliyê Zîlan derbas dibe. A. Bedir, jiyana gund, Kurmanciya Geliyê Zîlan, navê nebat, peyvên jiyana gundan, biwêj, gotinên pêşiyan û çîrok û mîtosên li gund hîn dibe û berhev dike. Bala xwe dide li ser vê dewlemendiya Kurmanciyê û roj were ev Kurmanciya, dê destê wî de bibe 'Ferhenga Kurmanciya Geliyê Zîlan' (Ferheng, berbi çapê ye). Di sala 1998an de di dibistana amadekariyê de, ji ber xebatên polîtîk dikeve zindanê. A. Bedir, piştre diçe Zankoya Stembolê beşa derûnnasiyê dixwîne. Li gor gotina xwe "Avakarê Edebiyata Dengbêjesk" e. Bi stîla dengbêjan helbest û romanan dinivîse, edebiyateke bi navê "Wêjeya Dengbêjesk" ava kiriye. Bi vê stîlê pirtûka Xemzêm, piştî xebata deh sala nivîsandiye.

## Berhemdarî

* Heba Mezadı/Kuğunun Günahı, Şiir, Tilki Kitap, 2014, İstanbul
* Xemzêm, Helbest, Weşanên J&J, 2016, Amed

## Goristaneke Winda: Enfal…

(fermana li esmanê hovistanekî…)
digo, navê miriyan li ser tirban tunebûn!
 (kêlikan, çev li hibra nav digerand.)
digo, mirî, li ser zimanê çolistanê, ji tîna miribûn.
 (li wir, jinên reşgirêdayî bûne kêlik.)
digotin:
Li wir, deqa li ser sûretê jinan,
bibû nav û nivîsa kêlik.
Li wê çolê,
hezar jinên reşgirêdayî,
jinên bî, biyên reşgirêdayî,
şîna mêrên serwindakirî danîbûn.
Çevên xwe girtibûn
û ew tirbên winda,
ew tirbên di bin xaliya çolê de dianîn li ber çevên xwe.
Çevên wan reş ve dihat.
Reşaya ku li xwe girêdabûn,
reşeya şînê, dibû reşaya şevê,
li goristana binerd belav dibû.
Çavên wan, li hespê xemê siyar bibû,
diçû li binê erdê, li wan tirban digeriyan.
Digo: Ew mêr, ji tîbûnê mirine.
Digo ew roj, ev roj e,
jin, avê dibin û mexberan av didin.
Digo ew mirî, hê jî tî ne.
Wek çolê, wek çolê tî ne.
Digo ew mirî, wê avê vedixwin.
Goristaneke winda, li wê çolê…
Mirî tî; tirb, bêkêlik…

Ew jin, li tirbên miriyan geriyan, nedîtin.
Li wir, mêrek, kirin mêrê xwe;
kurek, kirin kurê xwe,
zarrek kirin zarra xwe.
Li ser kêlikekî nivîsîne navê bav, kur, zarr…
Digo ew merzel hewandine êdî.
Ew merzel…
(awir, kêlik; çev, tirb in!)
Mirî, ji gora xwe xeyîdîbûn.

# RONAHÎ FARQÎNÎ

## Jiyanname

**Ronahî Farqînî;** Li Farqînê navçeya Amedê hatiye dinê. Beşa mamostetiya cil û bergan xilas kiriye. Di warê fermîyetê de, di rêxistinê partî û gelek saziyên sivîl de wek endam xwebitiye. Niha jî li ser zimanê kurdî di gelek kom û saziyande cih digre û car caran wergerê dike. Di heman demê de jî pirtûka xwe ya helbestan gîhandîye ber çapê...

## Helebçe

Helebçe birîndar e
Demsala biharê û xwezayê
Rengê xwe ji tovê jiyanê re
Hêdî hêdî amade dikir

Lê ehrîmanên asîman
Ji sêvan misk û ji xerdelê jî bêhna emberê
Di ewrên reş tarî de dicivandin
Û
Bi navê Ellah û Ekber
Di sala 1988an de
Li ser zarokên welatê rojê dibarandin

Bavê ji laşê bê giyan re
Xwe kiribû zembîla nîv dernexwîn
Di tofanan de
Dê ewladê xwe diavêtin
Lê ne dê mabû û ne jî ewlad

Qêrîna keçên ciwan
Bûkên dest bi hine
Bêhna sêvan
Û
Dengê bombeyên atomê li hev diketin
Li ser xaka bê xwedî

Helebçe birîndar e
Xwedawendên rûyê erdê bêdengin
Û xemgîniya ne jidil li rûyê xwe dipêçin
Lê di hundirên devên xwe de
diranên xwe tûj dikirin
Bi vê xebîsîya xwe
Xerdelê û sêvan dikirin hevparên gunehên xwe
Û
Tovên mirinê li welatê xêr nedî di reşandin

Qada helepçe
Ji laşên bê giyan ên li ser bedena xwe
Wek bûka keskesorê hatibûn raxistin
Fedî dikir û ji hêsirên wê rûbar diherikîn

Xerdela çav zerik
Ji pelên xwe kefen
Li bejna narîn û tifalan
Bi diranên sêvan dibirî

Helebçe û Hîroşîma
Ji cîhana bêbext re bûbûn berdêlî
Wan bi diyariya gaza kîmyewî ve tacîdar dikirin
Zarokên welatê rojê
Bi tavê de digiriyan
Tav jî bi wan de bêhna sêvan dibaran
Û dinavbera wan de bûbû keleha zilmê

Helebçe birîndar e
Xerdel û sêvê bi destmala şil a hêsirên çavên hîroşima
Li cîhana hegomonîk bi ser govenda çekên kîmyewî
Bi kêfxweşî li qada navnetewî li ba dikirin
Laşên zarokên welatê rojê
Ji sifra xwe re kiribûn havyar
Û
Ji ava sêvan
Mey noşê hev dikirin

# ŞEVGER ÇOLO

## Jiyanname

**Şevger Çolo;** Ez li nêzî Cizîra Bota li gundê Hoser jiyan dikim. Ajokariyê dikim. Di navbera Başûrê Kurdîstan û Bakûr heta bi tevahî bajarên Tirkiyê Îran û Azerbayjan, bi cil û bergê kurdî diçim û têm. Yanî bi barkêşiyê debara xwe dikim heroj li bajarekî xerîbim û dûrî zarokên xwe me. Di projeya min de xebata xeta ewropa jî heye di pêşe rojê de lê hê nebûye teqez. Mixabin min hêj yek berhem jî çap nekiriye û min xwe têr û amade ne dîtiye. Lewma ez ne nivîskar û helbestvanim. Tenê bi jiyana rojane çandî jiyan dikim û li zimanê xwe dibim xwedî…

## Wêneyê Helebçe

Dema wêneyekî ji helepçe dibînim,
Di wê gavê de, bêhna kizûrê tê pozê min.
Ji xwere dibêjim, belkî bêhna sêvên rizî bê
Û dema di goristanekî de, tirba zarokekî dibînim,
kêriyên artêşa hegemonan li ber çavê min di xijmijin,
ez dibêjim qey xewna dibînim.
Û yek bi yek
Wan gorê biçuk, bi çîrok û serpêha-
tiyên wan ve nîşan dikim.
Min nedizanî, ez li make bajarê xwe me
Lewma wekî xewna li ber min xwiya dikir.
Mane di bajarê mede jiyan qaos bi xwe bu.
Û min digot,
Ev zarok bi qasî salên temenê xwe gu-
leya di singa xwe de dihewînê.
Û ev zarokê din ji ber hejmara dengdana te ya zêde,
ji aliyê komek leşker ve hate gule baran kirin.
Û ev ciwan jî bi wesayitek zirxî ve di nava sûka bajêr de,
di erdê re hate kaş kirin.
Û ev zarok jî ji ber guleya leşkerê deshi-
lata bi dengê te hatî hilbijartin,
Lingê xwe winda kir û lê bû êşa giran,

Û jiyana xwe ji dest da.
Û ev zarok jî dayika wê di girtî gehê de bu.
Li kolanê ma di bin wesayitekî de.
Û ev zarok jî dema dayik û bavê wê çun ser-
dana zîndaniya dîwar bi ser de herifî.
Û ev herdûk jî li ser sergo dilîstin, amû-
rekî leşkerî di nav destê wan de teqa.
Û ev zarok jî di hilweşandina baja-
ran de di bin xaniyan de fetisîn.
Û ev ê he jî ji birçîna mir.
Û ev jî ji ber dayik û bavê wan ji aliyê hêza teybet
ve hatibûn kuştin ji qehrê sêwitiya xwe mirin.
Û ev zarok jî, qaşo dibêjin nan dabun mêhvanekî
xerîb xaniyê wan hate gulebaran kirin hingî mir.
Te zanî hey xwe firoşo?
Deng dana te di bêhvila te re werê
Xwarê.
Hey bê rumet.

## Êşa Helebçe

Dil bi zare zare
Fîxan û heware
Ne cihe ne ware
Ev çawe zeman bu
Dijminek xedare

Helepçe dil jare
Çi êşek dijware
Cendek birîndare
Ev çawe dewran bu
Ji kulan di are

Neyar li ser kare
Niza ev çend care
Qet jê nayê xware
Ev çawe tofan bu
Rumetek bê pare

Dijmin hov û hare
Ewr sêva di bare
Me qîr û heware
Ev çawe xumam bu
Deng li xwidê nare

# ŞÊXMÛS SEFER

## Jiyanname

Şêxmûs Sefer; helbestvanekî kurd e. Ew di sala 1977an de li Mêrdînê hatiye cîhanê û li Amedê dijî. Di rojnameya Azadiya Welat de nêzî sê sala karê rojnamegeriyê kiriye. Li navenda Çand û Hunerê ya Cegerxwîn du sala mamostetî kiriye. Nêzî şeş sala ji bo televîzyonên Kurdî bi navê Bêndera Çandê bernameyên çand û hunerê amade û pêşkeş kiriye. Di Komeleya Nivîskarên Kurd a Amedê, di Navenda Pena Kurd û di konfederasyona KESK ê de bi salên dirêj wekî rêvebir xebitîye. Ji bo şanoya bajêr ya Amedê helbestên mûzîkalên Hamlet û Mem û Zîn nivîsandiye. Pirtûka Konstantin Stanislavsky ya bi navê Afirandina Karakterekê wergerandiye Kurdî.

## Berhemdarî:

* Bîstan Hatin Berdan, Helbest, Weşanên Lîs, 2006, Amed
* Piştî Xezal Terqiyan, Helbest, Weşanên Ronahî, 2011, Amed.

## Helebçe

Tu hesrên min yê çikyayî ku nikarim li dû te bigirîm
Tu çîyayê min ê herî bilind î ku berf lê nagire
Tu zaroktiya min a herî mazlûm î
ku bi dû etarekî winda dibî
Tu erşa dinyayê ku hemû ezman li te hatiye xezebê
Tu masiyê çemê xwe yî ku nagihîje tu behran
Tu rengê dinyayê yê herî reş î
Tu pêre rûreşiya dinyayê…
Tu zarokekî hembêzkiriyî ne li cem tu kesî
Tu kalemêrekî bi siûd î di hembêza zarokekî…

# DILDAR WELAT

## Jiyanname

Dildar Welat; Di sala 1988an de li gundekî girêdayî navçeya Amedê Farqînê çavên xwe li cîhanê vedike.

Li gor agahiyên dayika dildar, ew di du saliya xwe de ji ber nexweşiyekê di astek jor de ronahîya çavên xwe winda dike.

Ji ber şerê qirêj yê li welêt, di sala 1994an de bi malbata xwe re koçî bajarê Êlîhê dike.

Ji ber astengîya nedîtina çavan, dibistan wî qeyd nakin û ew ji xeyalên xwe yên xwendinê bê par dimîne.

Ji berk u hezkirina wî ya xwendinê pir mezin e, di temenê xwe yê biçûk de xwe fêrî xwendin û nivîsandinê dike.

Bi lêdana rîtman û li hev anîna gotinan di wî temenê biçûk de jî, hezkirina xwe ya ji hunerê derdixe pêş.

Piştî 12 salên tije zor û zehmetî di sala 2006an de bi malbata xwe re vedigere gundê xwe. Dildar di sala 2007an de bi xwişka xwe (ya ku ew jî weka wî heman qederê parve dike û wek wî astengdar e) Evîndarê re dest bi hestnivîsa Kurdî dike û beramberî hemû şert û mercên astengdarîyên jiyanê jî berhema xwe diafirîne.

## Berhemdarî:

- Ronya, Helbest, Weşanên Sîtav, 2020

## Helebçe

Ji hawareke bê binî
Zarîna zarokên Helebçe
Yên laşhelîyayî
Di guhê cîhana çavrijîyayî de olan dide
Û dîrokê
Mirin dibarand ji rondikên reş, ji ewrên biharê
Li wê şeva şazdehê Adarê.